Darbeciler kısa bir zamanda Irak Komünist Partisinin ve kitlelerin katliamına başladı.

Askeri darbenin hemen ardından,işçi sınıfı mücadelesine büyük bir darbe vurduktan sonra hükümet,Kürdistan'a doğru yol alarak,savaş tekrar patlak verdi.

Darbeciler anti-Sovyet bir politikaya sahiptiler.Bu politikanın gün ışığına kavuşmasından sonra ancak kürd sorunu sovyetler Birliği tarafından keşifedilebilirdi.Bu sırada MOğolistan hükümeti kudt meselesinin Birleşmiş milletler programına alınmasını ilan ediyordu.

Bir kaç aylık Abdul-Selam Arif döneminde,Baas partisi hükümetten atılarak,Mısır ve Cemal Abdul Nasır yanlısı bir siyaset güdüldü.

Irak hükümetindeki değişimlerle beraber Irak Komünist Partisinin de siyaseti değişti.Kürt milli meselesine olan desteği azaldı.Arif hükümetinin iyiliğini ve pozitif elementlerin mevcudiyetlerini savundu.

Aynı zamanda Barzani ile KDP merkez komitesi arasındaki çelişkiyi görüyoruz.Bu çelişki silahlı çatışmaya kadar büyüdü ve hareket Barzani ve ailesinin monopoluna geçti.

Barzani,hareketi monopoluna geçirmek,tüm siyasi ve askeri işlemleri yürütmek ve polit byro taraftarlarını tesirsiz bırakmak için,Arif hükümeti ile ilişkilere geçti.Fakat bütün çabalara rağmen savaş 1967 yılına kadar sürdü.

1967 de savaş kesildi.Bağdat hükümeti ile ilişkiler sonucu "LA MERKEZİ"deklarasyonu imzalandı.Bu dönemde Bezzaz hükümetin başkanıydı.Bundan dolayı da anlaşma 12 bentlik "BEZZAZ PLANI " adıyla tanınır.Fakat Bezzaz planında gerçekleşmedi ve savaş devam etti.

II-7-1968 de Irak'ta ikinci bir darbe oldu.Darbe Baas partisinin liderliğinde gerçekleşti.Kürdistan'daki kanlı savaş bu darbeyi izledi.

II MART 1970 TEN SONRA IRAK KÜRDİSTANI

1970 te 15 bendi içeren II Mart deklarasyonu ilan edildi.Bununla birlikte Kürdistan'daki savaş durdu.II Mart deklarasyonu,gerek Irak hükümeti ile yapılan antlaşmalar konusunda olsun ve gerekse bunlar arasındaki yakınlaşma derecesinde olsun tüm öncekilerden daha kapsamlı ve yönlü idi.

II Mart deklarasyonunun bir kaç önemli noktaları şunlardı.

Irak anayasasında Irakın kurt. ve arabaların müşterek yurdunun olduğunun belirtilmesi.

Kürtlerin yaşadığı bölgelerde kürtçenin resmi dil olarak kabul edilmesi.

Kürdistan'da toprak reformunun gerçekleşmesi.

Cumhur-reisi yardımcısının kürtlerden olması.

Kürt dil ve edebiyatının ilerletilmesi, pêşmergelerin tekrar işlerinin başına dönmeleri vs...gibi noktalardı. Ve II Mart deklarasyonu dört yıl içinde gerçekleşecekti.

II MART DEKLARASYONUNUN NETİCELERİ

II Mart deklarasyonu, genel olarak Irak'ta ve özel olarak Kürdistan'da gerici çevrelerin güçlenmesi ile sonuçlandı.

Gerici Barzani-parti liderliği, büyük çapta propaganda imkanlarını elde edip, kürt meselesini çözüme bağlayacak ve tüm kürtlerin "önderi" olarak kendisini tanıttıyordu.

Ayrı görüşlerin oluşu ve eleştiri imkanları tamamen kısıtlanmıştı.

Casusluk mekanizması olan "PARASTİN" politik yaşamın her alanına elini uzatmıştı.

Yüzlerce işbirlikçi ve hareketin görevlileri II mart'tan sonra memurluk ve bakanlıklarda yer aldılar. Kitleleri sömürerek, onların hesaplarına her biri zengin ve para sahibi oldular. Kitlelerle ilişkilerin de ve oturup kalkmalarında daha evelki arabça konuşanlarinkinden daha iyi değildiler.

Toprak reformu ve köylülerin yaşam şartlarının iyileştirilmesi bentleri unutulurken, II Mart deklarasyonunun tatbikatındaki Kürt memurlarının büyük para ve maaşlar konuları ile ilgili işlemlere katılmaları Barzani liderliği ile Bağdat hükümeti arasında çelişkiler oluşturdu.

Bir birlerine karşı savaşmaktan kurtulan Barzani-parti liderliği ve Bağdat hükümeti, her biri kendi bölgesinde demokratik muhalefeti yoketme çabalarına giriştiler. Demokratik haklar daha fazla kısıtlandırıldılar.

İşçi sendikalarının, gençlik, öğrenci ve kadın hakları örgütlerinin öncülük ve politik çizgileri tamamen Barzaninin kontrolüne geçti.

İşçi sınıfı ve mücadelesine karşı sövenist Irak hükümetinin sümürü ve baskısı dahada keskinleşti.

II Mart deklarasyonu, hakim kapitalist sistem çerçevesi içinde Kürt burjuvazisinin, elde etmek istediği otonominin bir yansıması idi. Elbette, "Kürt sorununun bu çözümü" içinde taşıdığı çelişkilerden dolayı uzun ömürlü ve

sürekli olamazdı. Barzani ile Baas hükümeti arasında savaş, an meselesi idi ve siyasi gözlemciler 1973 te savaşın patlak vermesini bekliyorlardı.

Daha evel belirttiğimiz gibi II Mart deklarasyonu dört yıl içinde gerçekleşecekti. Fakat 1974 yılının başında Bağdat hükümeti, Baas yanlısı Kürtleri toplayıp onları otonominin görevlileri olarak ilan etti. Barzani taraftarı bakanlar hükümetten çekilip Kürdistan'a döndüler. Ve II Mart 1974 te bir yıllık süren kanlı savaş tekrar başladı.

Bu savaş çok yönleri ile geçmiş savaşlardan farklıydı. Askeri yönden daha çok büyümüş ve genişlemişti. Ağır silahlar karşılıklı kullanılıyordu. Hareketin liderliği bazı bölgeler de gerila savaşını bırakarak, cephe savaşlarına başlamıştı.

Siyasi yönden iki belirli farklılık göze çarpıyordu:

1) Pêşmergelerin savaş ve mücadeleye merak ve intereselerinin azalması ve oluşan demoralizasyon. Ki buda liderlik siyasetinin direkt neticesi olarak çoğalan siyasi, düşünce terörü ve rüşvetin ürünleriydi.

Fakir köylüler pêşmergelerin çoğunluğunu oluşturuyorlardı. Bu köylülerin milliyetçi sloganlar etrafında harekete katılmaları bir gerçektir. Fakat kendi ekonomik, politik durum ve şartlarının iyileşmesinin kurd milli sorununun çözümüne bağlı olduğunun görüşünde idiler. Dört yıllık bekleme, barış ümid ve isteklerini gerçekleştirmedi.

2) İran ile sınırsız ilişkiler, yakınlaşmalar ve İran Şahı'na mutlak güvence.

Önceleri İran Şahı ile yapılan ilişkiler bir dereceye kadar sınırlı ve gizli idiler. Fakat bu sefer İran'ın askeri güçleri açık

bir şekilde pêşmergeleri eğitiyorlardı. Şah'ın askeri kamyonları kervanlar halinde pêşmergelere silah ve erzak taşıyorlardı. Bu sene (1974-75) içerisinde gerici Şah rejimi yanlısı güçler hareketi dahada kontrollerine aldılar. Askeri ve politik iktidar gerici elemanların, Barzani ve ailesinin ellerine geçti. Barzani'nin oğullarından İdris, askeri birliklerin ve Mesut da "Parastının" yetkilileri oldular.

Bir yıllık savaştan sonra, Cezair de, İran Şahı ile Saddam Huseyin arasında bir antlaşma imzalandı. Bununla da İran ile Irak arasındaki anlaşmazlıklar ortadan kalkıyordu.

Kürt halkı tarihinde çoğu kez görüldüğü gibi, bu defa da Kürdistanı aralarında parçalamış hükümetler Kürt halkının hesabına bir birlerine yaklaştılar ve dostluk paktlarını oluşturdular.

İran Şahının artık Barzani ve Irak Kürdistanındaki harekete ihtiyacı kalmamıştı. Bundan dolayı da Şah, Barzaniye olan yardımını kesti.

Irak Kürdistanındaki silahlı hareket kartondan yapılmış bir bina gibi yıkıldı. Barzani ve diğer tüm liderler, başları önlerinde İran'a doğru yol aldılar.

Barzani-parti teslimiyet ve ihaneti uzun bir analiz ister. Fakat biz burda sadece hareketin bazı ders ve tecrübelerine işaret etmekle yetineceğiz:

a) Barzani-parti teslimiyet ve ihanetinin yegane sebebi; Kürt burjuvazisi ve mülk sahibi sınıflarının Kürt milli hareketini başarıya ulaştırmalarındaki acizlik ve yeteneksizlikleridir. Barzani-parti liderliği, gerek maddi ve gerekse insani güç konularında her hangi bir eksiklikleri yoktu. Kürdistan'da büyük çapta ağır ve hafif silahlar mevcuttu. Binlerce silahlı, mücadeleye hazır idiler. Barzani'nin kaçıışı gerici ve yanlısı siyasetinin neticesinden başka bir şey değildir.

Başlangıçta, Barzani hain bir kişi değildi. Nevarki takip ettiği politik yol ve sınıf savaşının mantığı yavaş yavaş onu kaçınılmaz olarak ihanete kadar götürdü.

Nasyonalist güçlerin ellerine bir daha böyle büyük imkanların geçmesi ve bu şekilde şartların lehlerine ikinci bir kez dönmesi çok zordur kenatımızca. Çekinmeden söylenilebilir ki, gerici güçler, son tarihi kozlarını

oyundular ve en büyük şanslarını kullandılar.

Barzani-parti ihanetiyle Kürt milli mücadelesi son bulmadı ve devrimcilerin mücadelesi devam edecektir.

Kürt milli hareketine öncülük etmek ve onu başarıya kadar götürmek proletaryanın tarihi görevlerinden birisidir.

b) Kürt milli meselesi tek bir parçada, Kürdistan'ın diğer parçalarından ve komşu ülkelerden kopuk olarak görülemez.

Barzani-parti liderliği, Kürt milli sorununu yalnız Irak Kürdistanında görüp, sadece Irak sınırları içinde bir çözüme bağlamak istiyordu. Hareketi liderliğinin gerekçesi; dört ülkeye karşı savaşamayacakları idi. Ve şunu ekliyordu, "Kürdistanı aralarında bölen diğer ülkeleri tarafsız bırakmak için onları meseleye katmasak daha iyi olur". Bu yanlıs ve lokalist siyasetin mantığı icabı ihanete gidilen yol izlenildi. Diğer ülkeleri tarafsızlaştırma politikası giderek, dostluk ve desteklemelerle sonuçlandı. Kürdistan'ın diğer parçalarındaki mücadelelerden söz etmemek ise, bu parçalardaki hareketlere yabancılaşma ile neticelendi. Bazen de bu hareketlere karşı açık savaşa kadar gidildi.

Kürt milli hareketi, tek bir parçada ve gerici güçlerin önderliğinde bile olsa; büyük bir dinamizm ve diğer parçalardaki geniş bir uyanmayı içerir. Bu uyanma ve dinamizm mevcut durum için tehlikeler yaratır ve sataus-koa darbe vurur. Bundan dolayı da bölgenin gerici hükümetleri bütün güçleri ile böyle bir harekete karşıdır.

Bundan sonraki Kürt milli hareketinin her yeni liderliği bu gerçekleri görmesi gerekir. Kürdistanı aralarında bölmüş gerici hükümetle olan ilişkilerinde uyanık ve çok dikkatli davranması şarttır.

Gerek Kürt milli sorunu çözümünün ağırlığından ve gerekse güttükleri "taktik" ve siyasetlerinden dolayı olsun, şimdiye kadarki liderlikler hareketi diğer parçalardaki mücalededen ayırarak, tek bir parçada Kürt milli sorununu bir çözüme bağlamak istediler.

Bütün siyasi olaylar tekrar şu tarihi gerçeği ispatladılar: Kürt meselesinin radikal ve temel bir çözüm yolu, yalnız ve yalnız Kürdistan düzeyindeki kurulacak siyasi ve örgütsel

ilişkiler ile kürt halkının yaşamakta olduğu
ülkelerin işçi hareketleriyle sıkı bir işbir-
liğinden geçer.

Kürdistan'daki tarihi tecrübe ve olaylar
gösterdiği; yarınki devrim ,ya Sosyalist Dev-
rim yada devrimin bir karikatörü olacak.

www.arsivakurdi.org

ÇEND GOTIN LI SER

PÊWISTIYA VÊ KOVARÊ

Di şerê nav burjûwazî û proleterya de minet tune. Burjûwazî ji bo perçiqandina proleterya û pasîfîzekirina tevgera çînên zehmetkêş her metodî, ji metodên bi xwîn û har heta bi yên modern gişan bi kar tîne û tiştê jê tê teq-sîr nake.

Belê metodê bi riya dejenerekirina Marksîzm lêxistina hedefê bê gûman ji tevan bi tesîrtire.

Dejenerekirina "arksîzm bi hawakî yan bi hawê tir, bi karanîna wê ji bo hevkarîya nava sinifan û hê paşre kuştin û xerckirina dînamîzma komelanên xelkê wek metodekî berê xwe daye gelek bi kar tê anîn û ji zû de gihiştîye Kurdistan jî

Di kitêba Dana Adam Schmidt de ke li ser Berzanî hatîye nîvisandin di pelê 52 de ji şexalîya nav mixabirê rojname "Le Monde Eric Roulot û serokekî Partîya Demokratî Kurdistanî Îraqê (1963) perçak heye, ke li Kurdistan li ser şerê dijî kominîzm û metodên di vî alî de bi kar tîne anîn gelek tişt dibêje û têra xwe enteresan û orjînale. Em gotinên di vî pelê de derbas dibin neqlî vir dikin. Guh bidnê! Serok: "Partîya Komunîst endamên menî xort û milîtan dikşandin alyê xwe. Li gor tiştê ji Eric Roulot re gotîye ji bo endam ji Partî nema qut bibin Marksîzm-Lenînîzmek şiklî qebûl kirî ye. Min îlan kir ke partîya me ji "arksîzm-Lenînîzm îlhamê distîne. Van gotina tesîrek mezin li xortên "urd, ke heyranê "Marksîzm bûn kir. Paş vêna endamên me ji me nema qut bûn û kesî dî nema çû alyê Partîya Komunîst."

Xwedî van gotinên jorî ronakbîrekî Kurd de ke di tevgera siyasîyî 30-40 salên dawî ro-leke ne biçûk lîstîye. Vî kesî di serokayetîya rêxiravên başqe başqe di dewrên başqe başqe de cîh girtîye û ne kesekî hayela ye. Miyaneta burjû-azîya Kurd li Kurdistan'a Îraqê, li alîyekî ji bo heşkerkirina karekterê dijî şoreşgeriyî burjûwazî û li alyê dî ji bo keşkirina giş plan û programên dejene-

rekirina Marksîzm firsatek ke her car nakevê desta pêde kir.

Li alîyekî ji ber ke ev firsat bi kar nehate anîn û li alyê dî ji ber zêdebûna "dost û hevalbendên zehmetkêşan" di bin zora şertên objektîv û pêkhatina pêla çepîtîyeke fireh paş 1975'a, "programên ke îlhama xwe ji Marksîzm distînin" pir kirin û Marksîzma şiklî hê jî xwirtir bû.

Plan û programên wilo ke têgihiştin û nerîne-ke konkret karekterîze dikin û netîca xetek siyasî ne bi sala ye di nav tevgera Kurdî de rehên xwe berdane. Kolandin li rehên wênî ekonomîk, siyasî û sosyal pirs û wazîfek esasî ye.

Di alyê teorîk de dîtina bersiva vê pirsê û kişandina xeta nav ronakbîrên burjûwazî û Marksîzm û xebatek bê kompromîs û zelal di vê riyê de wazîfeke ke qat nayê lipaş xistin. Tarîxa tevgera komunîstî û tecrûba ji mere hatîye hiştin vêna dibêje.

Li Rûsya hê di sala 1883'ya de dest bi cewaba teorîkî pirs û meselên jorî hate kirin. "Gurûbê Kar" dest pê kir û paşre ev kar ji teref Lenîn û gurûbê Îskra hate تمام kirin: Parastina prensîpên bingehîn Marksîzm, provegende û bela kirina wan û realîzekirina wan di şer û pevçûna siyasî de li dij "arodnîk, Ekonomîst û giş cereyanên ronakbîriyî burjûwazî.

Gava pêşî û esasîyî şoreşgertîya Rûsya, ew şoreşgertîya ke hevkarîya nav çîna red kir, şerê xiyanet û oportunîzma Enternasyonala II'a ne sekinand, şerê emperyalîstî kire şerê navxwe û şoreşa Oktobir kir, wa hate avêtin.

Fêrbûna Marksîzm, xwedîderketin ji prensîpên marksîstî re û bê virde-wirde parastina wan ke ji her marksîstekî tê xwestin ne her bi tenê li dij burjûwazî û dek û dolabên wê, belê li dij her cereyanek dejenerebûyî nav tevgera kirêkarî jî gerantî û çekê bi tenêyî konse-

vente.

Wirseke dinî aktûelî rojê ke merev pêre pir tê himber hev û di behs û mînaqêşa de xwe di van gotinên jêrî de dixe berçavan û em pir dibîzin eve: "Em divê herin nav xelkê, wazîfa me şiyarkirina xelkê ye..." û gotinên bi vî rengî. Eva raste bê xelkê û beşdarîya xelkê qet guhertinek esasî û ciddî ne mîmkune. Lîr û bahwerek paş dikeve nava xelkê û xelkê

dixê hereketê dibe xweçî bingehêke madî û deryê iqtîdarê jêre vedibe.

Belê mesele bi vîna hahnabe û gotin û qebûl-kirina vê rastîyê bi serê xwe ne bese. Daxwaz û xwestekê di cîhê xwe de ne her tişte. Di gava yekê ber bi xelkê de em bi du sîualên dinî esasî wek a/ xelk kîye

b/ çî li ba me heye em bidin xelkê

re xwe li himber hev dibînin.

Bi giştî tarîxa "çûna nav xelkê" û tecrûba di vî alî de hatiye komkirin pir caran daye xwiyankirin ke: ewanê xelkê ji devê xwe naxin bi xwe bûne bela serê xelkê û mala xelkê xerakirine. Xelk kîye û kê çî da xelkê û dide divê zelal bibe. Çîret û daxwazên ne zelal bi kêrî xelkê nayin bi kêrî dijminê xelkê tîn. Berzanî di nav "xelkê" de bû û heta bazda Îran jî wek "xelkê" li xwe dikir. Di nav cilên Berzanî û cilên xelkê de ferqek tune bû/biner kitêba Adam Schmid/.

Ji roja gotina xelkê ketiye nav zimanê siyasî gotina xelkê û kombînasyonên bi vê gotinê re tene çêkirin wek îro ji mana xwenî rast bi vê derecê dûrneketine, bêqîmet û bê mane ne bûne. Çet bi qeys îro gotina "xelkê" awha ne bûye faktorê hevkarî û xebata mişterekî nav çîn û sinifên dijmin û li dij proleterya bi kêrî burjûwazî ne hatî ye.

Mûheqek ji ber vê jî ye ke burjûwaziya Kurd îro bi biçûk û mezinê xwe dostayetiya xwe bi xelkê re dibêje û gelek aktîv beşdarî kampanya popularîz kirina "xelkê" dibe.

wê burjûwazî di vê kampanyê de karibe carekî

dî bi serkeve û xelkê bi dû xe de bikşîne?? Reva Berzanî û xiyaneta burjûwazî keleha dijminên xelkê xerakir û kevir li ser kevir ne hişt. Ev bûyera ha ke kes ne li bendî bû û di hesabê kesî de tune bû, bi xwere reaksiyon û lehtek fireh di nava komelanên xelkê zehmetkêş de pêde kir. Tişteki dinî ke vê bûyerê bi xwere anî şuphe û şiyarbûne. Reaksiyona paş seknandina şer û teslîmbûna serokayetiya paşverû ke Kurdîstan tev girt îro hêdî hêdî cîhê xwe ji bêbahwerîyê re beramber xet û alternatîvên kevnarî siyasî re vedike. Midaxele di vî prosesî de û xwirtkirina wê jî yek ji wazîfên rojêyî marksîstên şoreşgere.

Di şiyarkirina komelanên xelkê de tişteki bi qeys xiyaneta burjû azîya welatekî ke bi xel-

kê wî welatî re miletekî pêk tîne tesîr nake. Yekîtiya burjûwaziya Fransa bi burjûwaziya Alman re li dij proleterên Fransa, li Fransa şerê çînayeti tûjtir kir û sebebê esasî pêk anî ji bo girtina iqtîdarê ji teref proleterya Parîs sala 1971 ê. Eynî tişt bi hawakî di li Rûsya qewimî sala 1917-18. Reva burjûwaziya Kurd jî bi serokayetiya Berzanî bi dehan pîrs û sîual di serê xelkê de çêkirin û rolek mezin lîst di şiyarkirina xelkê de.

Sloganên berê ew sloganên kevn û klasîk ke wextê wan jî zû de derbasbûne gelek zehmete ke bê reaksiyon û dijayetiyeke ciddî karibin cardî xelkê zehmetkêş li dor xwe kom bikin û di hereketê xin. Guhertin û pêşketina van çend salên dawî vîna dibêje.

Li Kurdîstan dinya têra xwe hatiye guhertin. Em ketine dewreke nuhî siyasî. Bûyer û guhertinên salên paş 1975'a ke me li paş xwe hiştin gelk dolemend û radîkal bûn. Di hundurê vê peryodê de hin partî û gurûb rabûn, hineka xwe li gor "şertên nuh" guhert û heta bi "kirîtîka xwe" çûn û alî û gurûbên nuh pêk hatin. Dewra "her perçe û partîyêkê" hate girtin û di jiyana siyasî û rêkxirawî de em ketin çaxê plûralîzm.

Lesf û dirûvên aliçêbûna nuh çîye? Alyên wênî karakterîstîk di kude ne? Kîjan tendens hakimî û perspektîvên wê çîne? Eva jî çend sîualên dinî aktûelin. Li pîrs û sîualên kevn yên nuh zêde bûne.

Gelek pîrsên esasî ke li hin alyên dinyayê eva bi sedan sale hatine halkirin li Kurdîstan hê li bendî helê xwe ne. Her midaxele û hewldana burjûwaziya kurdî ji bo halkirina van mesela û dîtina cewabekê ji bo van pîrsa ji wê pêve ke helê rast û bi tenê li paş xe bi kêrî tişteki nehatî ye. Di alyê teorîk de zelalkirina vê rastîyê, konkretir kirina wê û dolemend kirina wê bi belge û materyalên bi ruh jî di nav wazîfên esasî de gerek bê hiymartin.

Ew em dibînin pîrs û sîualên ke Marksîzm li Kurdîstan bi wan re li himber heve ne yek û dido ne û gelek pîrsên elementer hene ke get dest wan ne hatiye dan. Li himber vîna jî cewab ji sîuala "Em Çî Bikin"? pêve karê çî be?? Di rewşa îro de em cewabek ji vê rastîr nabînin.

Di merhalak taybetiyî pêşketinê de wexta tevgera

marksîstî li wûsya bi sûala "em çi bikin" hati bû himber hev, gelek tiştên esasî hati bûn kirin û bi kêmanî 7-8 sal di ser "dewra derketin û xwegirtina teorî û programekî marksîstî re" (Lenin Em Çi Bikin) derbas bi bû.

Bi bahwerîya me wazîfa berî her wazîfê tê î-ro xebat ji bo "teorî û programekî marksîstî" ye.

Em bi kovara Em Çi Bikin ke her du meha carekê bi zimanên Tirkî û Kurdî wê derkevê beşdarî vê xebatê dibin.

ji vê sergêjekîyê

çawa derkevin ?!

K.H.E.Y.V.A.N. S.

Çi gava ez du rêza ji ilmê marxîzm, ilmê hilweşandin û perçekirina mekanîzma çînên xwedî mulk û avekirina civata bêçîn ji teref proletarya bixwînim, bixwazim çend rêzan binivîsim û di vê meydana şer û xebatê de beşdar bibim ev sualên li jêr: "Em çibikin, ji ku destpê bikin" û ji vê herî û teqanê çilo derkevin tên bîramin. Bi ser wê de gi hîn di sala 1902 de Lenin bersiva van sualan ke di hundirê tevgerê derketibûn û derdikevin dabû.

Ji ber ke binheg u esasek maddîyî giş bûyer û pirsên civakî heye, bîngehek maddîyî van sualên aktûel jî heye. Çînên xwedî mulk ke bîngeh û sergeha civatê di destê van deye, ji bo dejenerekirin, reformîzekirina çînê bê mulk proletarya û ji bo ke proletarya avê li aşê wanke tiştê ji destê wan hat doh kirin û î-ro jî dikin.

Garantîya kommunistan û proletaryayê têgihîştî ji bo nekevin xefk û dolabên burjûwazî, reformîstîyî berdevkên burjûwazî di nav tevgerê de û ji teref wan neyên xapandin, tenê û bi tenê: "Xwe organîzekirina proletaryayî bi temamî serbixwe û şer û xebata siyasîyî serbixwe ye". Eger proletarya vêna neke û di tevgerê de, bi fraksiyonek burjûwazî re şer û xebatek musterek bike, nikare serbixebûna xwenî siyasî biparêze û ne jî di şerê çînekî li dijî çînê din (şerê proletarya li dijî çînên xwedî mulk) serokayetîyê di destê xwe ke û bi armancên xwe bighê.

Efsana dînî bû ke Brehîm pêxember ji agirê (1) Nemrût xelas kir. Efsana xulamê xwedayê xwedan Zews Apollo bû ke di şerê Sardes de melekê Lydia Kroisos ji nav agirê melekê Ecem (2) Kroisos derxist. ⁽³⁾ Belê şerê proletarya li dijî çînên xwedî mulk ne efsane ye. Heger proletarya bi burjûwazî re di cephakî keve yan lê nêzik bibe yan jî pêre yekîtîyekê çêke, tu x.edê nikari wê ji agirê mitralyozê burjûwazî xelas bike.

Ji ber ke, î-ro li timamê dunyê di nav pranî-

ya wana ke bi nave proletarya dengdikin, li şûna xetek rastî marxîstî yanî xwe organîze- kirin û xebata serbixweyî siyasî, xeta reformîstîyî organîzebûnek bi flan yan bêvan fra- ksyona burjûwazî û şerê muşterekî bi burjûwa- zî re hakime, di mejîyê bi milyonan zahmetkê- şan de avekirina civatek bêçîn ji teref pro- letarya paş xistina çînen xwedî mulk wek ef- saneyekê tê dîtin. Evana sebebên nezelalî û tevlihevîya di serê zahmetkêşan de ye û bin- geha sualên ji bo xelasî û rizgarbûnêyî: "Em çibikin, ji ku destpêbikin" û ji vê herî û te- qanê çilo derkevin ne.

Her kesekî gi ilmê şerê proletarya li dijî çî- nênan xwedî mulk, Marxîsm ferdike, tédighê û hayê wî jê heye, zane ke Marxîsm ji derveyî proletar- ya tê nava proletarya û jê re dibe mal. Lê belê ji ber ke îro "proletarya dunyê di bin krîzek îdeolojîkî dinalê", bi salan derblî Lenînzîma Bolşevîkî hatîyexistin, bikar anîna navê Marx û Engels wek tiştêkî xerîb lê tênerîn û tu di- bê qey ne 107 sal di ser Kommuna Parîs re û 61 sal di ser şoreşa sosyalîstî Oktober re derbas bûye. Îro her kesekî di ser û rêzên tev- gera proletarya de cîh girtibe û her partîyek ke serokayetîya harekete bike wezîfên wanî esasî: parastin û bixelkê gihandina marxîsmê û danîna Lenînzîma Bolşevîkî li ser lingê xwe ye ke bi salan li ser serî hatiye danîn. Ji bo wilo jî tiştê pêwîste bêkin: Wek ke Lenîn ge- lek caran tekrardike û K. Liebknecht dibêje "bi- xwînin, propaganda bikin û organîze bikin" slo- ganê rojê ye.

Ez na bêjim û îdia nakim ke problem û meşaki- lîn teorîkîyî tevgera proletarya Kurdistan ke perçek ji proletarya dunyê ye û bi proletarya Ereb, Tirk û Fars re xwedî qederekê ye, halbûne. Halnebûna proplemên proletarya Kurdistan bi wêve girêdayîye ke proletarya mintîqê hîn ne- bûye xwedî xetek vekirî, eşkere û Marxîstî. Ça- wa burjûwazîya mintîqê bi gelek ben û werîsan bihevduve hatiye girêdan û tesîrê li hevdu di- ke, her wiha proletarya mintîqê jî bi hevduve girêdayî ye û tesîr li hevdu dike.

Wek beşek ji burjûwazîya dunyê burjûwazîya kurd bi wezîfên xwenî tarîxî ranebû û nika- re rabe.

Heta di rêzên proletarya Kurdistan de ke wê tabûta burjûwazîya kurd têxe tîrbê, oportî- nîzîm "yanî bi burjûwazî re çephe pêkanîn,

nêzikayî lê, çêkirina yekîtiyekê pêre"(4) li şûna internasyonalîzm, lokalîzm hakimbe û heta li şûna interese û menfeetên çînayetîyî internasyonalîstî proletarya pragmatizma prî- mîtîv cirît bavêje, proletarya Kurdistan bi wezîfên xwenî tarîxî nikare rabe û wê tim di dawa burjûwazî de rûnê û nikare xwe ji dek û dolabên burjûwazî xelas bike.

Gelo em karin proletarya mesûlê: dîtina ke be- şek ji burjûwazî (burjûwazîya milî, burjûwazîya li dijî herdu dewletên super, burjûwazîya navê) kare bide du proletarya, dengkirin bi navê pro- letarya û danîna burjûwazî wek hakem, qebûlki- rina lokalîzm li şûna internasyonalîsm, dere- wên ke vê burjûwazî bi proletarya re berê çe- kê xwe bide burjûwazîya derve, dîtina sosyal- şovenîstî (5) ji dêlva dîtina mesela milî wek parçek ji tevgera proletaryayî çînayetî, qebûl- kirina şoreşa sê çîna li şûna şoreşa prole- tarya, dîtînen antî-marxîstî li ser mesela dewletê (ji dêlva dewleta proletarya, dewleta xelkê) û bi kurtî mesûlê ke haraket bi giştî ketîye herî û teqanê bibînin? helbet na! Mesûlên van giş rezaletîyên bi navê marxîsm dibin û heraket ketîye herî û teqanê ne pro- letarya ye. Mesûl, kalpazanên ke bi navê prole- tarya dengdikin ne. Ji ber ke proletarya nika- re li dijî xwe be, berdevkên burjûwazîyî dixwa- zin bi hezar xefk û dolaban, proletarya bike terî ji burjûwazî re mesûlê van giş xerabiya- ne.

Paqîşkirina tevgera krêkarî ji kurm û miqro- ban li alîyekî û ziwakirin û çilkandina kanî- ya teqana îro li alyê din:

- a) Tévgera krêkarî li bêjinge divê bexistin,
- b) "Edaleta tarîxî" gerek bê cîh,
- c) Marxîsm ji marxîsm bi xwe divê bê xwen-

din û ji komelanên xelkêre bibe mal dixwaze. wî çaxî emê binerîn ka zeman ji kêre dişixu- le û roj ji bo kê dire ave. Û vî çagî lawê xort û proletarya wê heq ji burjûwazî derke- ve. (6)

NOT

1) Şerê Sardes, bîner: Herodot tarihi, Remzi ki- tabevi 1973 rûpel 49-51

2) Li ser Kyros, bîner: a.g.e. rûpel 61-71

3)Di mîtolojiya Yunan de Apollon,xwedayê tîr û kevane.Û wek xwedayê hakîm derbasdibe.

4)Li ser oportunîzim û sosyal şovenîzm biner: Giş nivîsandinên Lenîn,cilt 2I rûpel I43-45 Dietz Verlag Berlîn I974

5)a.g.e. rûpel I43-45

6)Helbesta Ahmet Arif hatiye adeptekirin.

ŞERÊ ÇÎNAYETÎ Û MESELA

MILLÎ LI FINLAND !!

Wergêr: H Î W A

Me roj kare Şoreşa I9I8 î Fînland wek perçak ji pêlên şoreşeyî bi Şerê yekêyî Cîhanî re ke Ewrûpa girt ber xwe û wek ber û produktê Şoreşa Mezinî Oktober bibîne.Eger em Rûsya li alîkî deynin, ev şoreş jî wek tevgerên şoreşgeriyî din bi destên bixwînî dijî-şoreşê hate xeniqandin.Ev şkestin ne her bitenê netica negihabûn û nemusaîtbûna muwazena hêzanî li hundir û li derve yî ji bo demek pir kurt û mûqet ,belê ji vê bêhtir ber û netica kêmanî û şaşiyên serokayetîya tevgerê yanî faktorê sùbjektîv bû.

Di wext û zamanê me de em haraket û bûyerên bi vî rengî,di alyê tarîxî de wek paralêla bûyerên li Çîlî dibînin. ,ke di peryod û welatên core-cor de dibin sebeb û bingehên netîce û guhertinan di pozîsyonên Reformist û şoreşgeran de.Berî em derbasbin ser van meselan emê çavakî bavêjin ser meselên esasî û bingehînî Şoreşa Fînland.

Mesela milîyî Fînland,faktorek esasî bû ji koma faktorên rabûna I9I7-18.Fînland hîn ji salên I800 de otonomîk berzî Çar bû.Belê di dewra Nîkolas II de otonomî ket bin şuphê û rejîmê çar bi zanistî welat di alyê sîyasî, ekonomîkî û kulturî de bi xweve bêtar girêda û dest bi asîmlekirinê kir.

Ev siyaseta bêyî wê ke Çar Fînland bi hêza xwenî polîsî dagre nikarîbû biserkeve.Siyasete çar,dibin serokayetîya Partîya Krâkarî Sosyal Demokratî(SDP)de bi dijayetîyek pir mezin û sert re hat himber hev.SDP li vê siyasetê wek tehdîdek li dijî interese û menfetên çînê krêkar nerî û binling kirina heq û azadîya nivrêyî di dewra otonomî de hatibû stendin ji teref vê siyaseta xist ber çavan.

BURJÛWAZÎ JÎ HEVDÛ DIKEVE

Heqê SDP hebû.Ji ber ke aparata polîsî Çar û brokrasya wî ji burjûwazîya Fînlandî zeîf,

bêhêz û bêçek di çewsandin û zulm û zorzarî de hezar carî bitesîrtir, bitecrûbetir û efektîvtir bû. Eşkere û tabîî ye ke burjûwaziya milî ne li dijî represyon û masakrên li çînê krêkar dibûn. Belê gava otonomiya wîyî kulturî ket bin şuphê, prosesê jî destgirtina otonomî xurttir bû û interese û menfeetên wîyî ekonomîkî jê hatin stendin, burjûwazî jî hevdû de ket û bû çend fraksiyon. Qismek jî burjûwazî piştgirîya siyaseta çarî ke dihate meşandin kir û rêyek "teslîmbûnê" neqand. Beşekî bi şeweyek 'pasîv' li dijî vê siyasetê rawestîya û qismekî di jî bi metodên komplot û terorîstî "aktîv li dijî sekinî."

Heta gi hukmê Çar bihêz û stabîl bû piraniyek mezinî burjûwazî jî bo parastina îmtiyazên xwe piştgirîya wî (hukmê çar) kir. Paş rabûnên komelanên zahmetkêşên xelkêyî Adara 1917, jî bo garantiya interese û menfeetên xwe û tîrs û cefla jî Rusya şoreşger, burjûwaziya milî cara pêşî li ser serbixwebûn û cihêbûna Fînlând jî Rusya fikirî. Belê jî ber ke burjûwazî ne xwedî aparatekê bû bi tiştêkî wilo ranebû û jî rejîmê Krensky veneqetya ke jê re bi tehlîke bû û problem û meşakul pêktanîn. Bi eksê vê burjûwazî ev rejîm li dijî tevgera bikaranî. Belakirin û rûxandina parlamenta Fînlând-ke piranî SDP bûn-di Havîna 1917 a de mîsalek jî bo vê yekê ye.

Paş Şoreşa Bolşevîkan derba pêşî burjûwazî da ser rêyek ultra-nasyonalîstî û bi dengêk pir bilind bahsa "serbixwebûnê" kir û xwedî jêre derket. "Kîna li dijî rusa" ke 25 sal paş re bû barek pir giran li ser piştta patriôtîsma Fînlândî, bi şeweyek rasîstî û bi hîsterî li her derî belakir.

Bi alîkarîya şovenîsm, kîn û xwestina xwenî bi dengêkî bilind, "şerê xelasbûnê" li dijî "Rûsan û hevalbendên wanî Fînlândî" di mobilîzekirina tebaqên navê û piraniya gundiyan (xwedî erdên biçûk) Bakur li dijî tevgera krêkarî di serdema krîtîkî şerê hundir de biser ket.

SOSYAL DEMOKRAT DIBIN NASYONALÎST

Helbet, pozisyona Partîya Krêkarî Sosyal Demokrat li beramber vê siyaseta Çar û piştgirî li şerê azadiyî milî di cîhê xwe debû û rast bû. Belê di hundirê vê prosesê de SDP ket

şaşîya klasîk ke pir caran derbê li tevgera krêkarîyî gelên bindest dixê û tehlîke û xeteran jî tevgerê re pêktîne. Partîya Krêkarî Sosyal Demokrat ne her bi tenê piştgirîya serbixwebûna milî û şer jî bo kir, belê di ey-nî wextî de, elementê îdeolojiya nasyonalîsm jî jî xwere kir mal û jêre bû xwedî. Netîca vê di praktîk de; girtina pozisyonek bêqerar li dijî burjûwazî û belakirina dîtinên nerast li ser burjûwaziye. Ev pozisyona hanê ket pêşîya gi Partî şoreşgerên Rusya, şaxê çepî INTERNASYONAL re têkeve dan û stendineke dîdirej, pêwîst û konsekwent û bû sebebê neşerkirin û eşkerenekirina nasyonalîsma burjûwazî jî komelanên zahmetkêşên xelkê re.

Ev giş nerastî û şaşîyên ke qedêr bi xwere tayin dikirin wek xelekên zincîrê yek bi dû yekê de derketin ser ruyê avê û eşkere bûn. Di nava sosyal demokratên de elementê xwe nasyonalîst nasdikir di nivê krîza berî şoreşa 1917 de bi çend fraksiyonên burjûwazî re hukûmeta koalîsyonê pêkanîn. Şaxê ke xwe jî nasyonalîsm parast û xwedî lê derket jî, rol û fonksiyona dîtin û bahwerîya nasyonalîsmî Dijî-şoreşgerî fêmkirin û tenegehî. Her jî ber vê jî ke ferqa hukmê Çar û krêkarên Rusya jî zahmetkêşan re nehat eşkerekirin û diyarkirin, di serdema rûniştinên di nav Krêkarên Fînlând û eskerên Sovyet jî bo ilankirina serbixwebûnê û pêkanîna dan û stendinên bira-yetî de, burjûwaziya Fînlând demge û muhra "hevalbendên dujmin" li krêkaran xist û di vîna de biserket.

Faktorê dudwayî şoreşa 1917-18 î Fînlând mesela erdê bû. Piraniya pêwendîyên mulkiyetê niv-feodalî bûn û hîn tu şoreşa burjûwazî ev pêwendî nerûxandibûn û ranekiribûn. Çend şiklên cewsandinêyî feodalî hebûn li Fînlând. Li teniştê çînê hakim (ji patronên malîkana pêve) î serbixwe, xwedî erdên mezin, li dervî bajêr li vir û dera han çiftlikên mîr û began hebûn. Ev grûbên han li ser deyn û keda sê tebaqên ke piraniya xelkê pêktanîn Nivkar, Reşayî (rêncber) û krêkarên erdê rûniştibûn û pêdijîyan.

Nivkar, îdara erdê di destên wan debû belê erd ne ê wan bû. Erdê ke diçandin dibin mulkiyeta xwedî erdên mezin yan jî began de bû. Li miqabil kirya erdê keda xwe yan jî hinik ji hatina xwe didan. Xwedî erd gava dixwest mukavele disekinand û destpêdikir erd jî xwe re dajot û diçand.

Reşayî, her bitenê xanîyek wanayî ke tê de bijîn hebû û ji xwedî erd re dixebitîn û kar dikirin.

Krêkarên erdê, ne xanîyek wan û ne jî erdê wan hebû. Bi buhakî gelek kêr û seetên karî bê sînor di çiftlikan de kardikirin. Rewş û jiyana va tebaqan ke ji 70 % prosentê xelkê pêxanîn rolek pir mezin di şerê hundirî Fînland de lîstin û xwedî cîhek giranin.

Di despêka salên 1800 de Nîvkar kêr zêde di emniyetê de bûn û rewşa wan baştir bû. Lê belê, di dawîya vê sedsalê de bi pêşketina îndustrîya kaxet û dar û bi zêdebûna buhayên erd û daristanan re, xwedî erdan zû bi zû dawîya mukavela anîn û prosesê avêtina Nîvkarên ji erdê, xurttir bû.

Bi vê prosesê re kirya erd jî zêdetir bû. Xwedî erdan, li şûna keda karî bê sînor li beramber kirya erd, ji berê pirtir û gelectir pere yan ji qismek ji ber û produktan xwestin. Şerê çînayetî zûtir, xwirttir û tûjtir bû. Nîvkarên li dijî zulm, zordarî çewisandin û xezeba xwedî erdan şer û pevçûn kirin û vî şerî bi avêtina Nîvkarên ji erdê netîca xwe dît. Avêtina bi sedan Nîvkar ji çiftlikan ji teref lordên lokalî Laukko bi alîkarîya orduyên KOSACK (1906-07) bitenê mîsaleke ji xezeba xwedî erdan re.

Bi van bûyeran re û di vê rewşê de, Reşayî berbi radîkalîzebûnekê de çûn. Bitaybetî di salên şoreşyê 1905-06 de ji bo meaşên zêde, seetên karî kentir û bidestxwexistina erdên re diçandîn şer û xebat kirin. "Ceryan û herka xulam û xizmetkarên nav tevgera krêkarî destpêkir".

KRÊKARÊN ERDÊ Û NÎVKAR MILÎSÊN SOR ÇÊDÎKÎN
Paş çend salên aşitî, bi şoreşa Adarê yê 1917 re û piştî şoreşê mesela erdê carek din aktuel bû û teqîya. Nîvkarên li dijî çewisandina xwedî erdan û ji bo rûxandina zulm û zordarîya wan dest bi hareketên massîv kirin û krêkarên erdê ji bo 8 seet roja kar, şerek xurt li dijî xwedî erdan dan. Hareketên bi koma yê zahmetkêşên xelkê û bi qerar û bi şidet welat ji serî heta bi binî hejandin. Bidestxwexistin û biserketinên biçûk û qismî his û xwestina proletaryayî şer û xebatê du qat kir.

Havînî dijayati xurtir û mezintir bû û şer bi timamê tuji û germîya xwe berdewamkir. Pa-yizî krêkarên erdê û Nîvkarên milîsên eskerî pêkanîn. Mahkûmkirin û girtinên xwedî erdên çavsor, greva giştîyê November taqîbîkir. Di Janûarî de piraniya Nîvkar û krêkarên erdê beşdarî şoreşa li Rojhilat bûn û pêre bûne yek. Li beramber vê, ji ber sebebên: xurtbûna nasyonalîzma burjûwazîyê xaponek, tesîra "şerê azadî li dijî rusa" û hakîmbûna urf û adetên dînî, gundîyên Bakur di şoreşê de cîhê xwe ne girtin û bi brayên xwenî Rojhilat re dest navêtin çek.

Li welatekî zîraiyê wek Finland proletarya bajêr bi hijmara xwe nispî kêr bû. Belê dawîya sedsalê rola helî muhîm û mezin lîst. Ji sala 1899 de krêkar di sef û rêzên sosyal demokra-tan de organîze bibûn. Di salên 1905-06 de wek destpêka tecrûbên xwenî şoreşgerî bi grevên mezin rabûn û şerek kahramanî li dijî ordûyên Kosack dan. Havîna 1906 milîsên sorî li Helsînkî di rabûna eskerên Rusyayî li Sveaborg de beşdarbûn û piştgirîya rabûnê kirin. Paş vê bi demek pir kurt berê çekê xwe dan burjû-wazîya xwe û bi hêzên eskerîyê çekdarî burjû-wazî re ketin şerek pir germ û mezin.



BERBÎ DUBBEL ÎKTÎDAR DE

Sala 1917 çînê krêkar ji her carî biqerar-tir û bihêztir dest bi şer î xebatê kir. Paş şoreşa Adarê ne bi gelekî komelanên zahmetkê-şên xelkê ketin hareketê. Li her cîhî niwênerên hukmê çar hatin girtin û rê û cade ji krêkarên ke ji demsrasyonê bazdidan demsrasyona di û ji civînê diçûn civînên din tiye û dagirtî bû. Ji ber ke tu aparatê burjû-wazîya Fînlandî ev walayîya ke pêkhatibû dag-re tunebû îdara bajarên mezin direkt di des-tên krêkaran debûn. Belê bi mezinbûn û fireh-bûna dubbel îktîdar re burjûwazî hêzên xwenî PARASTIN bi zûtirîn kat pêkanîn û organîze kirin.

Merov kare pêşketin û bihêzbûna çînê krêkar di vê dema tevgerêyî germ de bi rêqemên li jêr têxe ber çavan. Hîjmara endamên sendîka çarqat bibû û ji 40 000 hilkişîya 160 000 endamî. Heger em salên 1905-06 ne hejmêrin hejmar bûye çar, pênc qat û di praktîk de her krêkarekî îndustrî beşdarî grevan bû.

Karakterek taybetîyî vê xwestina şer hebû. Bi ser wê de şert û pêwendiyên kar (wek direj-bûna roja kar) faktorên giring û muhîm bûn û 40 000 krêkarên maden di Nisanê de ji bo 8 seet roja kar grevek giştî kirin jî, belê bi giştî BARİKADÊN ke di 1917-18 de ji teref krêkarên Fînland hatin çêkirin ne ber û pro-duktê pêwendî û rewşa produksiyonê bûn.

Ev barîkad bêhtir ber û neticên faktorên konjunktural bûn. Tesira şer û rewşa şerî li ser çînê krêkar û têgihîştina wîyî çînayetî, kêmayî û ternekirina malên xwarnê û spekulasyona wan, şoreşa Rusya û hebûna eskerên Rusya li Fînland, avêtina xeyal û umîdên ji parlemen-tarîsm (bitaybetî paş belakirin û fesihkirina parlamentêyî Temûzê û şkestina di hilbişarti-nên nuhî Oktober de) û xwe biçekkirina çînê burjûwazî çend faktorên esasî bûn ji yekîtîya van faktorên.

AVANGARDE NUHÎ KRÊKARÎ

Rewş û atmosfera berî şer û şer, derî ji îndustrîya çek û malzemên çek re vedikir. Orduya Rusya ket xebatek xurt li teniştên bahrê û dest bi planên ordugahan kir. Ev kar û aktîvî-te hêzek karî xort û biharaket kişand nav îndustrî. Ev hêza karî nuh bi eskerên şoreşgerî Rûsya re di pêwendî debûn û fermî fonksiyon-

nertîya ji ber xwe ve, hişk û bêharaketî di nav rêzên SDP de hakîm nebibûn.

Ji ber wilo ve jî ev heza karî nuh, ji heza karî berî xwe ji aksiyon, şer û pevçûn û meto-dên kar û xebatê re musaîttir, milîtantir û hazirtir bû. Em heta derwazê karin bêjin ke nav salên 1914-17 peryoda derketin û çêbûna avangardê krêkarîyî nuhî xort û milîtante.

Fêde û profitên îndustrîya şer mezin bûn û her şeweyê ticareta-sûkên reş freh dibûn û li her derê beladibûn. Li alîkî rewşa ke krêkar têde dijîyan û li alyê din "partiyên" bi milyonanî "eşqiyên şer" di serdema şer de ne-razîbûn û nefreta krêkaran zêdetir kir û krêkar behtir dahîdan nav şer û xebatê. Spekulasyona malên xwarnê û ticareta-sûkên reş bêhtir dibûn sebebên rabûn û pevçûnan. Bahara 1917 spekulatora di demê wade ke birçîbûn û xela li Fînland hebû ji bo zêdebûna buhayên mal depo û embarên xwe ji malên xwarnê dagirtin û veşartin.

Veşartina malên xwarnê rabûnên birçîbûnê bi xwere anîn. Havîna 1917 komelanên zahmetkêşên xelkê ji bo helê meselê însiyatîv kirin destên xwe, dest danîn ser depoyan û embar îstim-lak kirin. Yekîtîya van faktorên kûpê barûde û çirûska agirî ke vî kûpê biteqîne pêkhatin. Şerê çekdarî di nav krêkar û burjûwazî de destpêkir û krêkar di November de ketin Gre-va giştî. Ji vir û hade rêyek tenê hebû, yan mirin yan jiyan.

KRÊKAR LI DIJÎ BURJÛWAZÎ-SOR LI DIJÎ SÎPÎ

Bi şoreşa Adara 1917 re guhertin di muwa-zena nav hêzên şerê çînayetî de çêbûn. Burjû-wazî ji van guhertinan re hazirîya xwe nekiri bû.

Xetên siyasîyî core-coreî burjûwazî esasê xwe; li alîkî ji dijîyetîya nav ên ke bi Swê-dî dengdikirin û ên ke bi Fînlandî dipeyivîn û li alyê din ji pozisyonên Core-coreî li dijî hukmê Çar ('riya teslimbûnê; 'aktîv' û 'pasîv') disten. Bi her alyê xwe burjûwazî ji hevdû ketibû û perçebûyî bû. Rewş û şertên mevcût ji bo burjûwazî pir giring û muhîmbûn. Ji bo "Tehlîka Sor" bisekinîne û dipêşya wê keve burjûwazî mecbûr bû bi zûtirîn kat problem û meşakulên xwenî siyasî û teknîkî halbike.

BURJŪWAZÎ XWE BIÇEK DIKE

Ji meselên teknîkî burjûwazî dest bi kar kir. Timamê Havîn û Payizê di bin nav û mas-ka "hêzên serbest" de "hezên parastin" hatin biçekkirin û dest bi ders û talîma eskerî hate kirin. Li teniştê van hazirîyan fraksiyona burjûwazîyî ke piştgiriya opozisyona li dijî siyaseta çar dikir, bi Almanya împaratorî re zêdetir û bizanistîtir pêwendî çêkir û dan û stendinên wan behtir temerkuz bûn, Berî şer destpêbike çend hezar eskerên xwenî "nêçîrê" ji bo ders, talîm û terbiya eskerî şand Almanya û arîkarîya eskerî jê xwest.

Van pêwendîyan di cephên şerê hundir de ro- lek mezin lîstin û xwedî mahnek giring û mu- hîmin. Di eynî wextî de Fînlând ji zabitên multecîyî ordûya Tsar tije bû. Bi alîkarîya van, li Rojhilat li teniştê bahrê wek destpêka hazirîyên ji ordûya sipî re, merkezek ders û talîma eskerî hate organîzekirin. Bi greva No- vember re hîn ordûya sipî di alyê eskerî de xwe bitemamî organîze û hazirîya xwe nekiribû. Belê di Janûarî de li vir û li dera han dest bi jiçekkirina hêzên sor û elemanên şoreşgerî eskerê Rûsya kirin. Dawiya Janûarî, şer bi giş şidet û germîya xwe destpêkir.

GRÊKA AXIRÎ HEVKARÎYA ÇINAYETÎ

Hazirîya dinî burjûwazîyî şerê hundir, pêk- anîna yekîtîya siyasî bû. Heta bi Havîna 1917 hîn perçebûna burjûwazî mezin bû. Beşek ji burjûwazîya erdê û "aktîvist" bi piranîya çep- pê di parlamentê de di bin navê "hukm û îktî- dara qanûnê" di hilbijartinan de bi hevdu re deng dan. Di mana teorîkî de, hakîmîyeta helî mezin diket destên parlamentê û selahîyeta helî bilind pêdihate dan. Lê belê Krensky bi cevaba xweyî li dijî veyî belakirin û fesihki- rina parlamentê ke timamê burjûwazî piştgirî lê kir, yekîtîyek pêkanî û li ser razîbûn, Par- tiya Krêkarî Sosyal Demokratî tenê û biserê xwe hişt. SDP di hilbijartinên Oktober de bi- ser neket û bi şeweyek wekirî û li ber çavan di van hilbijartinan de şkest. Belakirina par- lementê dawiya hukûmeta koalîsyonî di nav SDP û hin partîyên burjûwazî de jî tanî û ji hev- dû de xist. Yanî grêka axirî hevkarîya di nav çînan de vebû.

Payîzî, burjûwazî li dor senatoyekê Kom bû û mesela "îktîdara dewletêyî bihêz" ji bo sekinan

dina "anarşî" aktueltir bû û li ser hate se- kinandin. Ji bo yekîtîyek burjûwazî li dor stratejîyek muşterek, hîn pêwîstî bi şoreşa Bolşevîkan û greva giştîyî November hebû. Ev bûyerên han dişibin bûyerên sala 1973 î ÇHİLÎ û bi tesira xwe wekhevîn.

Burjûwazî li dor senatoyekê yekîtîyek pêk- anî û wezîfên îlankirina "serbixwebûnê" û "avekirina întizama civakî" dan serokê xweyî ultra-paşverû P. Svînhufvûda. Ji van wezîfan wezîfa dudwaberê, li şûna P. Svînhufvûda, bi ra- qîbê wî, nokerê Alman, hevalbendê bloka emperya- lîstîyî Anglo-Sakson û generalê Tsar C.G. Mannerheim hatibû dan. Ev na jî sembolê dija- yetîyên nav çînê burjûwazî û îşareta nakokî û dijayetîyên mevcûtî di mesela alî tayinki- rinê de bû. Belê burjûwazî ji bo perçiqandina tevgera krêkarî ke jêre wezîfe û armancek pir akut û giringî rojê bû, yekîtîyek mutlak pêk- anî û bi hev re bûn yek.

HAZIRIYÊN ÇINÊ KRÊKAR JI BO ŞERÊ HUNDIR

Çînê krêkar di partîyek bitenêyî mass, Par- tiya Krêkarî Sosyal Demokratî û di sendîkan de organîze bibûn. Ev rêkxirawên han xwedî te- sîrek, bihêz û qûwetek xwe biqebûlkirindan, lê- xistin û rûxandinê bûn. Ne her bi tenê krêkar belê komelanên zahmetkêşan xelkêyî li dervî bajêr jî di van organîzasyonan de cîh girti- bûn û di nav wan debûn. Li welatekî ke bi Rus- ya Çar ve girêdayî di sala 1916 de, derba pêşî jî timamê dunyê li Fînlând, partîyek çînê krê- kar ke bihesanî piranîya cîh di parlamentê de girtibû çav dikşandin ser xwe.

Brokrasîbûna sendîkan ji kevn de ye û xwedî rehên kûrin. Bi teşebus û ceribandînen ketina pêşya tevgera kirêkarî (bitaybetî di serdana greva krêkarên maden de) û organîzekirin û ka- nalîzekirina krêkaran bi metod û formên kê- mîlîtantî û sist, brokratikbûn bêhtir eşkere dibû û derdiket ser ruwê erdê. Partiya krêkarî sosyal Demokratî, partîyek formel "ordoksî" marxîst bû. ORTODOXÎ A'LA KAUTSKY. Li paş fra- zelojiya marxîstî veşartî, belê ji stratejîyek şoreşger mahkûm û xwedî siyasetek bi temamî şaş û bixeterî PARLEMENTARSTÎ bû.

Tendensê esasî û bingehînî bûyerên sala 1917 a, dînamîzma şoreşgerî bû ke bi form û metodên mlîtantî netîca xwe dît û îşaret bi hebûn û aktuelbûna şerê nav çînayî nîkarîbû

bihata sekinandin dikin. Avangardê nuhî krê-
zarî ke di nav baraketê û şerde çêbibû rolek
esasî û mezin lîst. Avangardê nuh, aksiyon û
enerjîya xwe bi ên organîzasyonên kevnî ke
deng ji wan demediket re nikarîbûn girêbida-
na û kanalîze bikirna.

MILÎSÊN SOR HATIN ÇÊKIRIN

Di nav sosyal demokratên de her bitenê grû-
bekî biçûk bi Bolşevîkan re di dan û stendinê
debû. Bi ser kêmanîya xwe de vî grûbî wek rê û
şeweyê organîzebûnê pêkanîna milîsên sor dî-
tin û neqandin. Her çiqasî têgihîştina wan ge-
lek carî spcitant bû û bi metodên qebe û vêl
bi aksiyonên radîbûnê jî, xwedî dîtinê his û

bahwerîyek rast û kûr-ke ji bo xistina burjû-
wazî û girtina îktidarê xwe biçekkirin pêwis-
te-bûn û pozîsyona wan ji a SDP'yî bitere-
dud û libendeman, hezarcarî rastir û di cîhê
xwe de bû. Payizî, haraketa milîsên sor di nav
krêkarên hilbijartinan û Nivkaran de bipêşket
û mezin bû. Li Janûarî, di demê wade ke hêzên
PARASTIN wek "organê îktidarêyî qanûnî" hatin
îlankirin û teşebus û xebata jiçekkirina hê-
zên sor destpêkir bû, milîsên sor bûn yek û

DÎ NAV SOSYAL DEMOKRATAN DE HER BITENÊ GRÛBE-
KÎ BIÇÛK BI BOLŞEVÎKAN RE DÎ DAN Û STENDINÊ
DEBÛN

ordûya şoreşger pêkanîn.

Bi şeweyek objektîv gerek merov bêje û îş-
aret pêbike ke nezelalbûna îdeolojîkî, bi hin
alyên xwe anarşîstî û organîzebûna serbixwe
nikarîbû valayîya SDP li paş xwe hiştibû da-
girtana. Organîzebûna serbixwe ne wek konseyên
(sovyetên) krêkarî bûn ke di bin serokayetîyek
şoreşger de bi riya hilbijartinên demokratîk
pêktên û ferk di nava wan de hebû. Ev ferk û
newekhevbûn di serdema greva giştîyî November
de bi bêhêzbûn û jibindernekitina girtina îk-
tîdarê (ke beyî serokayetîyek musterek ne mum-
kune) û bi şerê hundir re roj bi roj eşkere-
tir bû û ket ber çavan.

JÎ GREVA MEZIN BERBI ŞERÊ HUNDIR DE

Dubel îqtîdara destpêkî hêdî hêdî bi-
hêztir û xwîrtir dibû û meydana valayî siyasî
paş Adara 1917 dagirt. Baharî, bi demonsrasyonên
mezin û grevên birçîbûnê firehtir û me-
zintir bû. Paş şoreşa Bolşevîka sala 1917 di
November de giha nokta xwenî helî bilind. Hef-

takê, di nav rojên 14-19 î November, di praktîkê
de îktîdar ketibû destên krêkaran û bi greve
giştî re îlan kirin. Komîtên lokalî grevê û
milîsên sor giştî îstasyon girtin dest xwe, me-
qamên resmî jî çekkirin û niwênerên hukûmetê
girtin. Ji bo jiyan û aboriya xwe dest danîn
ser malên xwarinê û komunîkasyon kontrol kirin.
Burjûwazî jî şer û pevçûnê re ne hazir bû. Li

beramber kar û aksiyonên zû û biqerarî kome-
lanên zahmetkêş ke burjûwazî ne libendebû û
texmîn nedikir şaşbû û sergêjekî lê gerya.

NOKTA VEGERÊ

Bi ser van gişa de şer û teqînên ke bi sîha
însan hatin kuştin çêbûn. Komîta ke serokaye-
tîya greve giştî dikir û formel bi Konseya
krêkaran hatibû binavkirin berî bi heftakê
pêkhatibû. Zêdebûn û pîrbûna his û xwestina
komelanên zahmetkêşên xelkê ji bo şer û xe-
batê ji a Partîya krêkarî sosyal demokratên,
rastîyek tarîxiyî li ber çavan bû. Ji ber wilo
jî gelek caran deklarasyonên şoreşgerî didan.
Belê elementê bişik, biteredud û bêqerar di
serokayetîyê de, diket pêşîya qerar û biryarên
esasî û bingehîn. Di serdema germî grevê de,
Konseya krêkaran bi biryarek formel girtina
îktîdarê îlan kir. Belê ev biryar di demê pîr
kurt de û zû hate kişandin û lexû bû.

Di wexta grevê di bin serokayetîya grûbê
SDP de demonsrasyonê ke bi hezaran kes têde
beşdar bû hate mobilîzekirin û dora parlamen-
ta Finland hate girtin. Armanç û xwestina de-
monsasyonê-ke wê rojê burjûwazî mecbûrbû qe-
bûl bikra- "em program dixwazin" bû. Naweroka
program li tenîştê çend xwestinên din, 8 seet
roja kar û heqên demokratîkî di hilbijartinên
beledîyê de didaber xwe ke evna mahnek bû ji
bo xelaskirin û sekinandina grevê ke serokaye-
tîyê ji berê de dixwest.

Ev teşebus û karê han, wek ke LENIN gelek ca-
ra di bîra me de tîne û îkaz dike; lîsk bi
şoreşê bû. Ji vir û pêde bûmîdî û hîrsa milî-
sên sor pirtirbû, tevger ber bi paş de çû û
însiyatîv ket destên burjûwazî. Ordûya sipî
li Rojhilat li Tenîştê bahrê bicîh bû û Janû-
arî senato neqlî vir bû. 27 ê Janûarî li Hel-
sînkî hukûmeta Şoreşger hate îlankirin.

Not: ev meqale ji rojnama "International"
organê "Yekîya Kirêkarên Kominîst" ha-
tîya wergerandin.

10 SAL PAŞ ŞEHÎDBÛNA HEVAL SMAÎL



Di Adara Îsal, Adara 1978 de 10 sal di ser şehîdbûna Smâil Şerîf Zade re derbas dibe. Ji bo ewanê Smâil ji nezîk ve nasdikirin xatirên Smâil ke awha bi rih û di bîr de mane, zehmete bahwer bikin ke deh sal me ji şehîdbûna wî hevalî bi dûr dikin. Heval Smâil di destpêka salên 1960 î de xwendevanê Fakulta Teknîk bû li Tehran. Di wan salên bi krîz de ke xebata siyasî li Îran ber bi guhertin û radîkalizasyonê de diçû, heval Smâil dest bi jiyana xwenî siyasîyî kir, belê qehremane kin û gelek bi zûyî ji pozisyona nasyonalîstîyî kurdî ber bi bîr û bahweryên çep û marksîstî de çû. Di vîserdemê de partiyên resmî û tradîsyonelî komunîstî wek partiya Tûde li Îran û Partiya Komunîstî Iraqê li mesela Kurdî bi hawakî marksîstî ne dinerîn

û pozisyoneke prensîpî ne digirtin. Her ji be vê siyaseta oportunistî bû ke li alîyekî serroketîya komelanên xelkê zahmetkêş li Kurdistan ne di destên wan de bû û li alyê di jî darbek mezin li nufûz û prestîja marksîzm xistî bûn. Partiyên nasyonalîstî Kurdî bi saya vê siyaseta oportunistî û ne şoreşgerî û bi rîya îstifadê ji mesela millî û zordariya millî hegemonya xebata siyasî li Kurdistan girti bûn destên xwe.

Mele Mistefayê Berzanî di seroketîya tevgera çekdarî li Kurdistanê Iraqê de ji piştgirî û nufûzeke pir mezin di nav piraniya Kurda de îstifade kir. Seroketîya Partiya Demokratî Kurdistanê Iranê di vê wextê de bi temamî bi seroketîya Berzanî ve girêdayî bû û xeteke siyasîyî rast dimeşand. Di rewşeke wa û atmosferê wayî siyasî de derbas kirina nasyonalîzm û dîwarên nasyonalîstî û çûna ber bi marksîzm ne hesan û rehet bû. Heval Smâil kete ser vê rîya dijwar û zehmet û bi germî û samîyeteke bê mîsal dest bi fêrbûn û belakirina bîr û bahwerên nuh kir.

Di behara 1965 a de dema mîrkujên Sawak hêrîş birin ser Kurdistanê, heval Smâil ke xwendevanê sala dawîyî fakulte bû xwendina xwe bi cîh hişt û wek gelêk xebatkerên dinî Kurd bi dizî çû Kurdistanê Iraqê. Ne bi gelekî paş çûna Iraqê wexta heval Smâil ji nêzîk ve seroketîya tevgerê naskir û pêwendîyên rejîmê Şah û Berzanî bi çavên xwe di dest bi dijayetîya siyaseta Berzanî kir.

Di netîca mantiqîyî vê pozisyona dijayetîyê de heval Smâil siyaseta seroketîya wê wextîyî Partiya Demokratî Kurdistanê Iranê wek siyasetek teslîmxwazî û kevneperest didît û pêre kete dijayetîyê.

Pêwendî û alîkariya seroketîya Berzanî û rejîmê Şah roj bi roj kûrtir û dostanetir dibû û giha bû derecê awha ke xebata siyasîyî marksîstî, nemaze ji bo wan kesên ke ji Kurdistanê Iran hati bûn ne mimkin dibû. Pîreh bûna aktivîta Sawak û siyaseta Berzanî îmkânê vegerandina Kurdên Iranê kiri bû meselak mezin. Heval Smâil û 200 xebatkerên dinî siyasî bi dizî ji Kurdistanê Iraqê derketin û çûne mintîqa çiya li Kurdistanê Iranê. Ev veşer, bûyerên bi xwinê salên 67-68, gelek xebatên bi mîranî û miqawemetên giran çî li meydana şer be û çî jî li zîndanê be bi xwere anî. Di tarîxê de hîç bûyereke vala na qewime û bela sebeb naçe.

Berpêhatîyên 67-68 xeteke qetî di nav siyaseta reformîstî û şoreşgerî, di nav dîtinên nasjonalîstî û marksîstî de di nav xebatkerên Kurd de kişand. Li alyê dî baştir û bitesîrtir ji her faktorekî din, siyaseta kevneperestî Berzanî heşkere kir. Vê xebatê û van şehîdbûnan wîjdanê gelek kesan hejand û çavên gelek xebatkerên Kurd vekir. Çend sala paşre vê carê xebatkerên Kurd ji Kurdistanê Turkîyê bûne qurbanê siyaseta Berzanî û bi xwîna wan şehîdan carekê di û hê bêhtir siyaseta kevneperestî Berzanî bi nas-
kirin da.

Berî heval Smaîl gelek bi xortanî û berî îmkan û qabîlyeta wî geş bibe û gula xwe veke şehîd bû. Lê mirina wî jî wek jiyana wî bi mêranî û tije îlhame.

Bîrewerî û xatira heval Smaîl û giş şehîdên rîya rizgarîya Kurdistan pîroz be.

Not: meqala jorî wergerandine ji beyana "Komîta Parêzgarî destkewt û prensîpên A.K.S.A" ye, ke bi zimanê erebî hatîye bela kirin.

ŞERÊ ÇÎNAYETÎ Û TEVGERA MILLIYÎ KURD LI IRAK PAŞ

SALA 1958

A L A N

Li gor xeberên gi ji Îraqê tîn, cardî agirê şer li Kurdistanê-Îraqê pêketiye.

Ev şerê niha dewama wî şerê kevnî gi di nav hukûmeta Bexdat û kurdan di sala 1961ê de çêbibû.

Ev şer heger ji ber lihevhatinên kin yan dirêj carna sekînî bi jî, her cardî berdewam bûyî. Lê belê di xet û serokayetiya vê tevgerê de gelekî guhertin çêbûne. Her di vî çaxî de pîr hukûmet li Bexdat hatin û çûn. Ji bo em rewşa Îraqeyî niha qenc nasbikin gerek em avirekê bavên tarîxa wan çend salên derbasbûyî û rewşa siyasî û ekonomîkîyî gi ev şoreş xwiliqandiye

IRAQ BERÎ 1958

Îraqê di destpêka çêbûna xwede perçak ji împaratoriya Brîtanya bû. Hukûmetên kevneperestî şahî, Feysey û Nûrî Seîd bi giş alyê xwenî ekonomîkî û siyasî bi emperyalîzma Îngilistan re hatibûn girêdan. Îraq bi Îngilistan, Îran, Pakîstan û Turkîye re endamê peymanê eskerîyî Bexdat bû.

Di çaxê hukmê şahî de partî û rêxirawên siyasîyî pêşverû hemî hatibûn menihkirin. Bitaybetî tevgera krêkarên Îraqê dibin zûlm û zordariyek mezin debû. Gelê kurd jî li Îraqê ji hemî mafên xwenî milî bêbahr û bêbeş bû.

Tevgera krêkarî, li wan cîhên gi krêkar pîr lê dijîyan û tevgera gelê kurdî ji bo daxwazên xwenî milî, du kanyê esasî bûn ji qewet û dînamîzma opozîsyonê re li dijî hukûmetê. Ji ber vê jî tahde û zixtên hukûmetê li van du cephan pîr dihate xwîyanîkirin.

Tevgera yekêyî mezin û serbixweyî çîne krêkar sala 1948 li bajarê Kerkûkê di nav krêkarên petrolê de pêkhat û ji alyê hukû-

metê bi hawakî barbarî û wahşîtî hat perçiqandin. Belê ev rabûn tesîreke gelek mezin li ser tarîxa tevgera krêkarî li Îraqê, tevgera siyasîyî li dijî emperyalîzm kir û gelek rabûnê siyasîyî din jî bi xwere anîn.

ŞOREŞA I4 Ê TEMÛZÊ SALA 1958 û KRÎZA SEROKAYETÎYA ŞOREŞGERÎ LI ÎRAQÊ

Roja I4 ê Temûz sala 1958 çend zabitên Îraqê bi navê "Zabitên Azad-Zobbat el Ahrar" di bin serokayetîya Abdul-Kerîm Kasim de rejîmê monarşîstî Îraqê hilweşandin û cumhûriyet îlan kirin.

Roja paş inqilaba eskerî, tevgera siyasî bi hawayekî ecêb xurt û mezin bû.

Serokayetîya hukûmeta nuh "Zabitên Azad" ne li bendî rabûn û şiyarbûnek xelkêyî wilo mezin bûn. Ji ber vê jî sergêjekî li wan gerya.

Komelanên zahmetkêşên xelkê bi însiyatîva xwe mesûlên terror û zulma hukûmeta kevn cedikirin.

Tevgera şoreşgerî halkirina pir meselên bingehîyî ekonomîkî û sosyal dixwest û hukûmeta cumhûrî ji halkirina van meselan aciz bû. Di bin zixta tevgera zahmetkêşên xelkê û şerê çîneyetî de di nav "Zabitên Azad" de ploralîzasyonêk pêkdihat. Du alîbûna di nav "Zabitên Azad" de jî hêdî hêdî ploralîzasyonêk êşkere dinav partiyên siyasî de çêdikir.

Partiyên Nasirî, Behsî û rêkxirawên nasyonalîstî erebîyên din, di bin sloganên nasyonalîzma-erebî û yekîtîya bi Misrê re li dora Abdul-Selam Arif kom bûn.

Partiya Kominîst, tevgera milîyî Kurd, çend rêkxiraw û şexsiyetên dinî pêşverû û hevalbendên nasyonalîzma Îraqî li dora Abdulkerîm Qasim kom bûn. Di netîca vê dijayetîyê di nav "Zabitên Azad" de, inqilabek eskerî bi destên Abdulselam Arif pêkhat ke bi serneket. Paş vê inqilabê komelanên zehmetkêşî Îraq li vegera hêzên rast, xwedî erd û kapîtalîsta bi tirs ketin. Hisên çîneyetî bi hezaran hezar zehmetkêşên Îraq rijandin ser cade û sikaka. Bi sedan hezar insan, cadên Bexdê û bajarên mezinî dinî Îraqê girtin destên xwe.

Hukûmeta Bonapartîstî Abdul-Kerîm Kasim, dixwest yekîtî û muwazena di nav çîna de biparêze. Helbet hukûmetê nikarîbû daxwaz û xwestekên zahmetkêşên Îraqêyî ji bo guhertinên esasî bicîh banya û ji xelkê parastina arantîyê dixwest. Lê kontrolkirina xelkê ji bo hukûmetêpir zor bû. Bitaybetî piştgirîya esker li tevgera zahmetkêşan, beşdarbûna wan di demonstrasyonan de û nebûna program û yekîtîyek hukûmetê îmkanê manewra siyasî li aliyê Abdul-Kerîm Kasim pir kêmkiribû.

Îraqê di rewşek berî-şoreşê de dijya û gelên mintîqê bi hevîyeke mizin çavê xwe berdabûn bûyerên şoreşgerî li Îraqê. Partiya Kommunistî Îraqê ke bihêztirîn û nufûstirîn partî bû, li ser wan tradîsyonê xwenî neşoreşgerî û reformîstî diçû. Bi anîna şîarên xwenî HEVKARÎYA NAV ÇÎNA û merhala şoreşa demokratîk, diket pêşya radîkalîzebûna tevgerê. Partiya Kommunistî Îraqê bandikir ke xelkê cada valabikin, vegerin ser karê xwe û arambûnê biparêzin. Giş beyan û belavokên wê çaxê şahidin ke çawa partiya kommunist xiyaret bi çîne krêkar û tevgera şoreşgerî Îraqê kir.

Vê siyaseta partiya kommunist yanî arîkarî di nava çîna de, piştgirî li bonapartîstê Abdul-Kerîm Kasim, helbet li gor mantiqê merhala şoreşa demokratîk, sekinandina tevgera spontanî xelkê û beşdarbûna endamên partiya kommunist di hukûmetê de ke nikarîbû problem û meşakulên bingehînî welat halbike, hêdî hêdî demoralîzasyon û sistîyek di nav xelkê de pêktanî.

Salên 1959-60, daxwazên krêkarên bajêr, xwestinên cotkarên fekirî ji bo erd û daxwazên gelê Kurd ji bo mafên xwenî milî wek haraketek muşterek, komelanên zahmetkêşên xelkê cumhûriyeta Îraqê dihejand.

Helê van pirsên esasî serokayetîyek şo-

reşger dixwest. Nebûna partîyek şoreşgerî-marxist mezintirîn kêmanîya subjektîvî wê çaxê bû. Serokayetîya reformîstî partiya kommunistî Îraqê, potansiyela şoreşgerî xelkê xeradikir û rê vedikir ji bo ke partiyên nasyonalîstî burjûwazî nufûsa xwe zêdebikin û xelkên nerazî bikşînin aliyê xwe.

DESTPÊKA RABÛNA ÇEKDARIYÎ 1961 Ê LI IRAQÊ
 Li Havîn û payiza 1961ê sê sal di ser cûm-
 hûriyeta Abdul-Kerîm Kasim re derbas dibû.
 Şerê çîneyetî dibin şikl û formên core-cor-
 de xwe dida xwiyanîkirin û gelek caran for-
 mên pir tuj digirt. Cotkar û feqîrên Kurdis-
 tan dest danîn ser erdê û axe bi zorê ji
 gundan derdixistin. Mesele wek rabûna cotka-
 rên li deşta Erbil.

Hukûmeta bonapartîstî Abdul-Kerîm Kasim
 ji çend reformên biçûkî despêkê pêve durtir
 nedîçû. Çend reformên biçûk, wek çêkirina hi-
 nik xaniyên ji bo krêkara û qebûlîkirina he-
 bûna gelê kurd li Iraqê bi gotin û çend re-
 formên din bersiva rewşê nedidan.

Guhertinên gi zahmetkêşên Iraqê dixwestin
 eşkere û vekirî hevkarî û aşitiya nav çînan
 xeradikir û çerçewa sistemê kapîtalîstî
 derbas dikirin.

Siyaseta hukûmeta Kasim ke reformên biçûk
 biçûk û helnekirina meselên radîkal û bin-
 gehî digirt ber xwe, li alyê çep krîtîk û
 nerazîbûnek dikişan ser xwe û li alyê rast
 jî nerazîbûn û tîrsek mezîna pêktanî. Hêzên
 kevneperest û hevalbendên monarşî bi alika-
 riya Şahê Îranê dijayetiya hukmê Kasim di-
 kirin û li komplota digeryan.

Di rûşek wilo de, axe û eşîrên Kurdis-
 tana-Iraqê ke li ser reformên hukûmeta Kasim
 nerazîbûn û ji xeter û tehlîka komunîzm
 pir ditirsîyan hêdî hêdî hevdû girtin û ra-
 bûnek çekdarî li dijî hukûmeta Kasim pêk-
 anîn. Helbet ji bo gi piştgiriyê ji xelkê
 bistînin ji helnebûna mesela milyî kurd
 sê-îstîfade dikirin.

Piştî herîşa eskerên Kasim hêzên axa ji
 hev bela-vela bûn. Lê belê fikra rabûna çek-
 darî cîhê xwe girt. Di 11/9/1961 de Partiya
 Demokratî Kurdistan û Mele-Mustefa Berzanî
 dest bi şerê çekdarî Kurdistanê Iraqê kirin.
 Sloganê Partiya Demokratî Kurdistan "otonomî
 ji bo Kurdistan û demokrasî ji bo Iraqê" bû
 û ev daxwaz wek sloganek esasî bû ji bo he-
 mi salên paşre.

Tevgera çekdarî xwe girt û li Kurdistanê Ira-
 qê gişî belabû. Cotkarên feqîr û bêerd ke
 piştgirî li hukûmeta Kasim û bitaybetî li
 partiya komunîstî Iraqê dikirin û bînetî-
 ce li bendî wan û pir tiştan bûn hêdî hêdî
 bêumîd dibûn û dibûne hevalbendên tevgera

çekdarî û Kurdistanê demokratî Kurdistanê Ira-
 qê.

Hukûmeta Kasim herîşek eskerî bir ser
 Kurdistan û Partiya komunîstî Iraqê jî ew
 rabûna axayên kevneperest ji xwe re dikir
 mahne û piştgirî li hukûmeta Kasim dikir.
 Zabitên 'kommunîst' di nav eskerên Iraqê de
 bi şeweyek aktîv beşdarî di bombardîman û
 hêrîşên eskerîyî ser Kurdistan de kirin.
 Di çaxê ke şer li Kurdistan pir germ bû
 Partiya komunîstî Iraqê, mitîng û lihev kom-
 bûnên mezîna mezîna ji bo aşitiya li Bakûr çê-
 dikirin.

Partiya Komunîstî Iraqê di siyaseta xwe-
 nî reformîstîyî ji bo parastina aşitiya li
 hundir û parastina dostayetiya û tîcaretê bi
 Sovyet re wa teqînî bû ke nikarîbû fêhm-
 bikra gi tevgera freh û mezîna milyî gund
 û bajarên Kurdistan dabû ber xwe bi prova-
 kasyona çend axe û eşîran çênabi.

Kîjan derece nizimbûna teorîkî û înhirafa
 siyasî pêwîste gelo, heta ke partiyek bi na-
 vê komunîstî pêkhatina heraketek mezîna
 xelkê ne ji ber faktorên ekonomîkî û sosyal
 lê belê di provakasyon û komplota çend ke-
 sên kevneperest de bibîne??



Vê siyaseta reformîst û teslîmbûnê yî Partîya Kommunist di çaxê destpêkirina şerê çekdarî li Kurdistana Îraqê derbek wilo mezin li îtibar û nufûza Partîya kommunist xist ke heta îro jî cîhê vê derbê xwiyayi.

Malesef di rewşek wilo de ji ber ke rêxirawek Marxîstîyî şoreşger tunebû gi li ser esasê analîzeke marxîstî nerastîya siyaseta xelet û şaşî Partîya kommunistî Îraqê ji xelkê re îzahbikê, vê siyaseta di nava xelkê de dijayetiyeke li dijî komunîsm û komunîsta çêkir û ji alîkî ve jî bû argûmentek di destên hêzên rast û nasyonalîstên kurd de ji bo dijayeti û şerê bîr û bahwerîya komunîsm li Kurdistan bikin.

Wek me berê jî got, şerê çekdarî li Kurdistana Îraqê di II/9/1961 de destpêkir û li Kurdistana Îraqê hemûçkî bela bû. Giş çî-nên ke di şerê çekdarî de beşdar bibûn li gor înterese û menfeetên xwenî çînayeti heraket didîtin û armancên heraketê teswîr dikirin. Heger burjûwaziya kurd bihêzbûn û biqûwetbûna xwe di tevgerê de didît, cotkarên kurd jî di vê heraketê de û di helbûna mesela milî de bidestketina erd û rizgarbûn ji destên axan didît. Zahmetkêşên bajaran jî başbûna rewşa xwenî ekonomîkî û sosyal di halbûna mesela milî û tevgerê de didîtin. Eynabûn bibûn hêzek mezin ji heraketa çekdarî re. Her ji ber wilo jî Partîya Demokratî Kurdistan wek partîya timamê xelkê dihat ber çav û dibin sloganê nasyonalîstî de hejmarek gelek mezinî xelkê organize dikir.

Paş destpêkirina şerê II/9/1961 heta bi peymana binav û dengî II ê Adara 1970 ê gelek înkilabên eskerî li Bexdat pêkhatin û pir cara dan û stendin di nav serokayetiya tevgera çekdarî li Kurdistan û hukûmeta Bexdat de çêbûn. Emê pir bi kinayî navê wan serpêhatî û bûyeran bihejmarin û wan têxin ber çavan. Ji bo naskirinek baştirî naverokê cewherên van bûyer, guhertin û dan û stendinan, pêwîstî bi îzahkirina alyên wanî esasî û muşterek heye. Di giş salên talî de sebebên ke şer dihatê sekinandin û dan û stendin destpêdikir ev bûn:

mehdûdîyetên tarîxîyî serokayetiya nasyonalîstî kurd. rê û îmkân li helê mesela milî

yî kurd digirt û helê ke heyî nikarîbû bi-dîta. Serokayetiya tevgerê tim û tim halbûna mesela kurd di çerçewa sîstemê mevcûdî kapitalîstî de û di netîca zixt û zorên li ser hukûmeta merkezî de didît û helê mesela kurd li Îraqê bi tevgera giştîyî şoreşgerî Îraqê ve girêdayî nedidît. Hêvî dikir û li bende bû ke bi zixt û zor û dan û stendinên bi hukûmetên burjûwazîyî Bexdat re mesele hel bibe.

Ew hukûmetên ke li Bexdat dihatin ser hukum ji ber înterese û menfeetên xwenî çînayeti û siyaseta şovenîstî li dijî kurdan, helbet nikarîbûn alternatîv û helek esasî ji mesela kurd re bibînin. Çi gava ke hukûmeta merkezî qels diket û tevgera krêkarî û demokratîk bihêz dibû hukûmet bi sekinandina şer û bi dan û stendinan razî dibû. Lê her car, wexta Berzanî dujminê xwenî hundir di nav tevgerê de bela-wela dikir û hukûmeta merkezî opozisyona demokratîk li Îraqê disekinand, dîsa agirê şer li Kurdistan pê-diket.

Wek pêşî jî me got niha emê pir bi kurtî behsa bûyerên berî II ê Adara 1970 bikin.

Di meha dudwa sala 1963 de paş sal û nîvek şer, înkilabek kevneperestî eskerî li alyê partiya Behs û Nasirîstên nasyonalîst li dijî Kasim çêbû. Wezîfa pêşîyî vê înkilabê perçiqandina zahmetkêşên Îraqê û rê lêgirtina komunîsm bû. Ji ber wilo jî înkilapçiyên li Bexde li Kurdistan şer sekinandin. Serokayetiya tevgera kurdî bi sekinandina şer di praktikê de piştgirîya înkilabê û perçiqandina tevgera krêkarî dikir.

Emê neha bi kurtî rewşa ji sala 1963 heta bi 1970 yî têxin ber çavan.

Paş înkilaba eskerîyî 1963 ne bi gelekî û paş ke hukûmetê derbek mezin li tevgera krêkarîyî Îraqê xist, berê xwe da Kurdistan û li Kurdistan destpêkir.

Siyaseta înkilapçiya li dijî Sovyet bû. Piştî heşkerebûna vê siyaseta, Sovyet bi derbekê re mesela kurd "keşîfîkir". Hukûmeta Moxolîstan îlana ke mesela kurd têkeve programê koma miletan, da.

Paş çend meha Abdul-Selam Arif, partîya Behs ji hukûmetê derxist û siyaseta nekêzîkbûn li Misrê û Cemal-Abdul Nasir destpêkir. Bi-dû van guhertinên di hukûmetê de

Partiya kommunistî Iraqê siyaseta xwe guhert ,piştgirya wê yî li mesela kurd sist bû,û digot ke hukûmeta Arif berbi başbûnê de dire û elementên pozîtîv têde hene.

Di eynî wextî de dijayetî di nav Berzanî û komîta merkezîyî Partiya Demokratî Kurdistanê Iraqê de pêkhat.Vê dijayetîyê heta bi şerekî vekirî dewamkir û piştî vê tarîxê serokayetîya heraketa çekdarî ket bin monopolê Berzanî û aîla wî.Berzanî ji bo ke di hundirê tevgerê de monopolê xwe bicîh bike, giş karên siyasî û eskerî di dest xwe xê û ji bo gi karibe bi şiklekî xurt li endamên mekteba siyasî xê bi hukûmeta Arif re dan û stendin destpêkirin.Lê cardî jî şer heta bi sala 1967 a berdewam bû.

Di sala 1967 de şer sekîni û netica dan û stendinê bi hukûmeta Bexdat re peyman bi nav û dengî La-merkezî--Bê merkezîyet çêbû. Wê çaxê serokê hukûmeta Bexdat Bezzaz bû.Ji ber vê jî ev peyman di bin navê planê I2 noktêyî Bezzaz de meşhûre.Belê ev peyman Bezzaz jî bi ser neket û şer carekin dewamkir.

KURDÎSTANA IRAQÊ,PAŞ II ADARA 1970

II Adarê sala 1970 peymanek aşîti ke I5 noqte digirt ber xwe,di nava Hukûmeta Behs û serokayetîya tevgera kurdî de hat îmzakirin.

Bi belabûna vê beyanê şer li Iraqê sekîni.Beyana II Adarê çî di mesela pirsên ke lihevhatin li ser çêbibû û çî jî di dereca li hevdû nezîkbûna serokayetîya tevgera kurd û hukûmeta Bexdat de be,jî giş lihevhatinên berê firehtir û piralîtir bû.

Çend jî wan noktên esasîyî peyman II Adarê evên li jêr bûn:

Qebûlkirina Iraqê wek welatek kurd û ereban di qanûna dewletê de.

Ke zimanê Kurdî li mintîqên kurdan bibe zimanê resmî.

Gerek muawinê serokê cumhûriyeta Iraqê kurd be.

Ew noktên dinî mayî li ser pêşxistina ziman û edebiyata kurdî,vegera pêşmergeyî ser kar û barê xwe û çend tiştên dinî wilo.... bûn.

Peymana II Adarê gerek di çar salan de bicîh bihata anîn.

NETÎCEN II ADARÊ

Netîcên eşkere û li ber çavî II Adarê li Iraqê bigiştî û li Kurdistan bitaybetî,bihêzbûn û biqewetbûna hêzên kevneperest û rast bûn.Serokayetîya kevneperestî Berzanî-Partî îmkânê propagandak mezin xistibû desên xwe û wek rêberkî giş kurdayî ke karîbû mesela kurd halbike xwe dixist ber çavan.Di wextek wade ke partiyek şoreşger jî tunebû jî hisên milî û nasyonallîzma kurdî îstifade dikir û monopolê Berzanî li Kurdistan hîn bêhtir bihêz dibû.İmkân jî bo bîr û bahwe-riyên core-core û mecalê krîtîkê kêmtir û zeiftir bibû û aparatê casûsîyî serokayetîya tevgerê bi navê"PARASTÎN" bêhtir destên xwe danîn ser jiyana siyasîyî welat.

Bi sedan karbidest û mesûlên tevgerê ke paş II Adarê bibûn wezîr û memûrên hukûmetê,zordarî û çavsorî li xelkê dikirin û li ser hesabên wan dolemend dibûn.Dan û stendin û rabûn û rûniştina wanî bi zahmet-kêşên Kurdistan re jî ê memûrên berêyî ke bi Erebi dengdikirin ne baştir bûn.

Tayinkirina memûrên kurd û beşdarî dipe-re û meaşên mezin de du noktên dinî peyman II Adarê bûn.Tedbiqkirin û bicîh anîna van herdû meselan di nav hukûmetê û serokayetîya Berzanî de xilaf û dijayetî pêkhatin.Lê belê ew bendên ke mesela reforma erdê û baştirkirina jiyana cotkaran digirtin ber xwe hatibûn jibîrakirin.

Serokayetîya Berzanî û hukûmeta Behs jî şerê hevdû rizgar bibûn û her yekî li mintîqa xwe berê xwe dabûn nehiştina opozisyonê siyasî.Azadiya demokratîk jî berê hîn kêmtir û bi sînortir bû.

Siyaset û serokayetîya sendîqên krêkaran, rêkxirawan,jiyana xort û xwendevanan hîn bêhtir ketibûn bin dest û kontrola serokayetîya Berzanî û bitaybetî Parastin.Hukûmeta şovenîst û dîktatorî Behs zulm û zordarîya xwenî li ser hêzên krêkarî xurttir û tûjtirkir.

Peymana II Adarê eksek û mîsalek bû jî bo otnomîya ke Burjûwazîya kurd dixwest û karîbû di çerçewa sistemê burjuwazî li Iraqê di dest xwe xê.Helbet ev"helê mese-la milîyî kurd" ke II Adarê bi xwe re anî bû,jî ber dijayetîyên esasîyî di xwe de di-

girtin nikarîbû helek dûdirej û daîmî büya û mesela bi nuhbûna şer di nav serokayetîya Berzanî-Partî û hukûmeta şovenistî Behs de mesela wext û zeman bû. Her di sala 1973 de çavdêr û observatorên siyasî li bendî destpêkirna şer bûn.

Her wek me berê jî bahskir Beyana II Adarê gerek di hundirê çar salan de bihata bi cîhanîn. Belê di destpêka sala 1974 de hukûmeta Bexdat kurdên hevalbendên Partîya Behs komkirin û ewna kirin mesûlên otonomî ji bo Kurdistan. Wezîrên Berzanî xwe ji hukûmetê kişandin û vegeryan Kurdistan. Di meha Adarê sala 1974 de şerekî pir bixwîn cardî destpêkir û salekê direjkir.

JÎ ŞERÊ ADARA 1974 HETA BÎ ADARA 1975 Û NETÎCÊN VÎ ŞERÎ

EV şer bi gelek alyên xwe ji şerê berî xwe ferq dikir. Di alyê eskerî de şer firehtir, mezintir bibû û herdu alyê çek û sîlehên gran li dijî hevdu bikar tanîn. Serokayetîya tevgerê li pir cîhan dev ji şerê partîzanî berdabû û dest bi şerê cepheyî kir.

Di alyê siyasî de jî du ferqên esasî di ketin ber çavan:

1) Kêmbûna merak û interese li cem pêşmergan ji bo şer û xebatê û demoralîzebûna wan. Evna jî direkt netîca siyaseta serokayetîya haraketê û produktê rêdebûna terora fikrî, siyasî û belabûna fesadî û bertîlê bû.

Piranîya pêşmergan cotkarên feqîr bûn. Ras- te gi cotkar li dor sloganên nasyonalistî kombibûn. Belê bi bahwerîya wan başbûna wez- hê wanî ekonomîkî û siyasî bi halbûna mese- la milîyî kurd ve girêdayî bû. Çar sal li hevhatin û aşitî daxwaz û hevîyên cotkaran bicîh nanîn.

2) Nêzîkbûn û lihevhatinên bê sînorî siya- sî û piştgirêdana mutlaqî serokayetîya tev- gerê bi şahê Îranê re.

Berê dan û stendin bi Îranê re heta bi derecakê bi dizî û bi sînor dibû. Belê vê carê bi şeweyek êşkere eskerê Îranê ders û talîm didan pêşmerge. Qemyonên eskerîyî Şah bi kerwana çek û erzaq ji pêşmerge re tanîn. Di vê salê 1974-75 de hegemonya elementên rast û xulamên rejîmê kevneperestî Şah di tevgerê de hîn bêhtir bihêz bûn. İktîdara siyasî û eskerî bi giştî ketibû destên

aîla Berzanî û "parastin". Ji layên Ber- zanî İdrîs mesûlê hêzên eskerî û Mesût me- sûlê aparata parastin bûn.

Paş salek şer di meha Adara 1975 de, di nav Seddam Husên û Şahê Îranê de li Cezaîr pey- manek çêbû. Bi vê peymanê re dijayetîyên nav Îran û Îraqê radibûn.

Wek gelek carên dinî di tarîxa gelê kurd- de ev welatên ke Kurdistan di nava xwe de beşkirine, li ser hesabê gelê kurd carek din li hevdu nêzîk bûn û "paktên dostayetîyê" pêkanîn.

İhtiyaca Şahê Îranê edî bi Berzanî û ha- raketa li Kurdistanê Îraqê nemabû. Ji ber vê jî Şah arîkariya xwenî bi Berzanî qutkir.

Tevgera çekdarî li Kurdistanê Îraqê wek xaniyek ji kartonê di çend rojan de hilwe- şiya û xerabû.

Berzanî û giş "serokên" tevgerê bi serekî tewyayî û firtî-firtî dev ji meydana şer qeryan û berê xwe dan Îranê.

Şkestin û teslîmbûna Berzanîyî sala 1975 analîzek kûr û dirêj dixwaze. Belê emê li vir îşaret bi çend ders û tecrûbên giring û bingehînê vê tevgerê bikin:

a) Şkestin û bazdana Berzanî-partî, bitenê û bitenê netîca acizbûna burjûwazî û çînên xwedî milkî di brêbirdina tevgera rizgarî- xwazî gelê kurd de ye. Serokayetîya Berzanî- partî, ne di alyê madî de û ne jî di alyê hêza insanî de tu kêmanî û desttengiya wan tunebû. Sîlehên sivik û giran bi hawakî zêde li Kurdistan hebûn û bi hezaran çekdar ji şer re hazirbûn. Bazdana Berzanî-partî ji netîca siyaseta wanî kevneperest û şaş pêve ne tişteki dibû.

Berzanî di destpêka xebata xwenî siyasî de ne insanekî xayin bû. Lê belê ew riya siyasîyî ke berzanî li ser diçû û mantiqê şerê çîneyetî hedî hêdî Berzanî ber bi xi- yanetê de bir.

Pir zahmete gi careke din ew hemû îmkanên mezin û şertên musaîd di destên hêzên nas- yonalîst de kom bibin. Bêtirs merov karê bêje ke evna şensê wanî tarîxî, mezin û da- wî bû.

Bi bazdana Berzanî-partîre xebata rizgarî- xwazî gelê kurd xelas nebû û xebatkerên kurd teslîm nabin. Serokayetîkirin û biser- xistina tevgera rizgarîxwazî gelê kurd, we-



zîfek tarxîyî proletarya ye.

b) Mesela kurd li perçakî ji perçêndinî Kurdistan û welatên cîran gerek neyê qut - kirin. Serokayetîya Berzanî-partî mesela milîyî kurd bitenê di çarçewa Kurdistanê Iraqê de didît û di-xwest di vê çarçevê de halbike.

Mahna serokayetîya haraketê ew bû ke, "nikare li dijî çar welata şer bike. Her bi vê mahnê jî argûment tanîn û dîgo: heger em bahsa perçên din nekin baştire ji bo neutralîzekirina hukûmetên Kurdistan di nava xwe de perçekirine. Mantiqê vê siyaseta şaş û lokalîstî hereketek ber bi xiyanetê de bû. Siyaseta newtralîzekirina welatên cîran hêdî hêdî digha merhala dostayetî û alîkarîyê Behsnekirina xebata gelê Kurd'li perçên dî digha merhala xerîbbûnê li wan û xebata wan û heta digha dijîyayî û serên vekirî bi tevgera wan re.

Xebata gelê Kurd ji bo mafên xwenî millî li perçakî Kurdistan bi serokayetîyek kevneperest jî be dînamîzmek wilo mezin di xwe de digre û rabûn û şiyarbûneke wilo mezin li perçên dî pêktîne ke rewşa mewcûdî mintîqê dixê xeterê û hîç hikûmetek kevneperestî mintîqê pê razî nabe.

Her serokayetîyeke kurdî ke paşê vê bê gerekê vê rastiyê baş li ber çav bigre û di dan û standina xwe de bi wan rejîmên kevneperest re ke Kurdistan di nava xwe de perçekirine pir şiyar û bi dîqet be.

Hemi serokayetîyên nasyonalîstî kurdî heta niha xwestine halê mesela millî, çî ji ber zehmetî û giranya meselê be û çî jî ji ber "taktîk" û siyasetê be bi tenê di çarçewa perçakî de îzole bikin û ji perçên dî qutkirî "hal" bikin.

Lê giş bûyer û biserhatyên siyasî dîsa û dîsan vê rastiya tarîxî ji mere şpat dikin, ke her halekî radîkal û bîngehiyî mesela Kurd bi tenê di çarçewa pêwendiyên siyasî û rêxirawî di nav xebata her çar perçên

Kurdistan û di alîkarî û hevaltîyên nêzîk bi tevgerên kirêkarîyî wan welatan ke Kurd tede dijîn îmkana xwe dibî.

Tecrûba tarîxî li Kurdistan û li welatên dîlîmkan û meçal dide me, ke bê tirs bêjin: Şoreşa sibe li Kurdistan yan şoreşeke sosyalîstî ye yan jî karîkatûra şoreşê ye.

KOMELA XWENDEVANÊN KURDISTAN, TARÎX Û REWŞA WÊN Î ÎRO **

T E R X A N

Bê gûman pirseke esasî di nav pirsên îro de ke pêşverû û antî emperyalîstên Kurd meşxûl dike û wextê wan digre, pêwistîyên piralîyî xebata hazir û rewşa nihayî komele ye. Her kesekî bi ehemîyeta rêkxirawekî Kurdistanî hisyay ye û zanê di şerê dijî paşverûtiya mintîqê rêkxirawekî wilo roleke çawa karê bilîzê, ji xwe û dora xwe dipirse: Komela Xwendevanên Kurdistan li derveyî welat ber bi kude diçe??

Ev sûal di minaqeşê de ye. Cewabên tene dan gelek caran pirsin dî jî tînin meydanê, ke yek ji wan jî eve: Kirîza komele xwe tê de di bîne ne îspatek be ji bo ke; xebata rêkxirawekî ke endamên xwe ji giş perçên Kurdistan digre ne mimkine, tiştêkî miweqet û zêde ye? Di wextek wa de ke xire-cira du xetên xwedî gotin tevger desentralîze û pasifîze kirîye û eva jî wek aktivîta bi tenê li ber çava ye, di dengê pêşî û nerîneke vêl de ev sûal wek sûaleke mantiqî tê guhan û pir ecêb nayê dîtin.

Bi bahwerîya me tiştê miweqet û zêde ne pêwistî û giringîya rêkxirawekî Kurdistanî ye ke ji her car bêhtir ji teref şertan tê xwestin, belê alternatîv û konsepsiyonên şaşin. Bi serneketin û îflasa rêyekê yan jî kevnbûna şiklekî organîzasyonî û pêwistîya şerê siyasî di nava rêkxirawekî bi tenê li şûna çendekî bela-wela du tiştên başqene û nabê bêne tevlihev kirin.

Di nav salên 1973-1975 de werta ke kar û xebata komele bi carekê re hate rawestandî û komele ji armancên xwe dûr keti bû, ev sûal cardî aktûel bû û di nav pirsên rojê de cîh girti bû. Guhertinên paş civîna Berlîn û çend sal xebata xwendevanên Kurd li ser xeta Kurdistanî, demokratîk û antî emperyalîst bêcîhbûn û pesimîzma sûala jorî derxist û bahwerîya bi organîzasyonê Kurdistanî çend oata xwirtir kir.

loganê Kurdistanîbûn ji her car bêhtir ketî ye nav ziman û termînolojîya siyasî û çet tu

carî bi qeys îro bela ne bûye.

Xebata 24-25 salên xwendevanên Kurd, pratîk û herka paş sala 1956 a di nav rêkxirawê komele de û çarîk qirnek têkoşîna organîzekirî li derveyî welat bi serê xwe cewaba sûala jorî daye. Xebata organîzekirî di nav rêkxirawekî Kurdistanî de bûye realîteyek û nema înkâr dibe. Ji hukûmetên paşverûyî dijminê zahmetkêşên gelê Kurd bi çar heta bi reformîstan ev realîte qebûlkirîna ke hewldana wan ji bo deformekirin û pasîv kirina komele nişan û delîlê vê qebûlkirinê bi xwe ye.

Ev alyê rastîyê xwedî tarîxek kevn û bi ruhe û ne cîhê behs û minaqeşêye. Tiştê behs û minaqeşe li ser gerek bê konsentrekirin, dînamîke û alyê esasîyî meselêyê, çilo û çawa bûna vê realîtê di pêşketinê de û organîzekirina wê li gor şertên rojê ye.

Heger her car bi siyaseta xwe nebe jî bi terkîb û struktûra xwenî endametîyê û tebieta xwe komele organîzasyonêke bi tenêyi Kurdistanîbûye.

Giringîya rêkxirawekî wilo wek sembolê yekîtîya Kurda û reaksiyonê beramber kevnepereştiya mintîqê, ke li alîyekî sisya di xwe de potansîyeleke dijî lokalîstî digre û meydanêke firehî kar û xebatê, hevdu naskirinê û guhertina bîr û bahwere, gerek çet neyê jibîr kirin û ji bo her analîzeke ciddî û şoreşger noqta herketê be...

Paş hinek minaqeşe li ser cîh û şûna komele û mana rêkxirawekî demokratîk û firehî Kurdistanî ji bo xebata menî siyasî li derveyî welat, em hinekî jî li ser guhertinên teqerê bi awîreke kurtî tarîxî rawestin da ke em reha krîza îro baştir bibînin.

Sala 1956'a hijmarek xwendevanên Kurd li Almaniya li bajarê Wiesbaden gihan hev û komele damezrandin. Damezrandina komele û liqên nuhî komele teqrîben heta sala 1960 î dewam dike. Paş sala 1960 î hijmara endamên komele û beşdarên kongrên komele bi derbekê re hildikşe, komele xwe digre, xwe di meydana siyasî de dide xwiyankirin û qebûlkirin. Sala 1964'a komele dibe endamê Yekîtîya Xwendevanên Cîhanî (IUS) Dijayetî û xîlafa paş salên 1964-63 endamên komele dike du birr. Du bendîtiya nav komele û alyên li dij hev, navên xwe li gor serokên

du alyê xîla'ê li Kurdistana Îraqê distînin. Îla'ê û şerê paş 1964'a heta bi sala 1964 a heta bi sala 1970 yî tê û bi serketina mitla-gî alyê Berzanî dawya xwe dibîne.

Paş kongrê Stokholm(1970) komele dikeve per-yodeke dî. Peryoda hegemonî û desthilata xeta paşverû dest pê dike û komele dikeve ser ri-ya bêganebûnê ji armancên xwe. Ev bêganebûn di kongrê Berlîn de(1973) dikevê kemla xwe. Komele serbixwebûna xwe bi temamî hunda dike, kar bi carekê re di sekine. Komele dibe şaxekî Partîya Demokratî Kurdistana Îraqê bi sero-kayetiya Berzanî.

Riyayeta burjûwaziya Kurd û reva Berzanî(1975) derîyekî nuhî xebatê bi perspektîvekî taze ve-ker. Di civîna Berlîn de(1975) cara yekê komele paş 19 salan bû du perçe. Xeta nav xwendevanên pêşverû û paşverû hate kişandin. Komîta Amade-kerina Kongre pêk hat û paş saleke xebat (1976) li Frankfûrt Komela Xwendevanên Kurdistan li derveyî welat çêbû. Prensîp û armancên komela nuh di destûr û rêbazekî nuh de çap bû û ala-hilgirê van prensîpan dengê komele kovara ASO ghiştê 5 hijmaran. Paş civîna Berlîn û nemaze di nav herdû kongrên Frankfûrt de xebatek baş hate kirin û komela taze baş hate naskirin. Paş kongrê didwayî Frankfûrt(1977) komele ke-te krîzê. Krîz heta îro ne sekinîye û roj bi roj kûrtir dibe. Timamê komele ji komîta birê-veberê giştî heta bi komîtên li qa seraser bi hemî hiyerarşîya xwe ji kar ketine û bi wazî-fên xwe ranabin. Prensîpên komele li ser wan avebûye û eva çend salin xebat li gor wan di-be di praktîk de kar nakin û hêza xwe hundaki-rine. Komele û liçên komele hatine leva kirin: Li Berlîn û Elmanya siyasetek û li Holenda û Îngilîstanê siyasetek dî tê gerandin. Kar bi carekê re sekinîye. Karê li vir û li dera han car-carna dibe jî ji bo ji ser xwe kirina de-ve xelkê, belekkirina meselê û jî fedîbûna re ye. Beyana li ser Cimhûrîyeta Mehabad ke berî bi çend rojan hatîye bela kirin paş çend meh derengî bûye. Heta niha komele bê destûre û paş 9 meh "bê destûrî" destûrekî "Îngilîzî" hatîye çap kirin. Pêwendîyên nav komîta jor û komîtên jêr gelk ne başin. Komîta Birêveberê Giştî qe-rarên bi xwe dide nayînê cîh. Heta niha birya-rên kongre wek çapkirina destûr bi herdû diya-lektên kurdî, çapkirina biryarên siyasî, gotarên mêvandan û derxistina kovara Aso ne hatine cîh.

Eva rewşa Komela Xwendevanên Kurdistan li der-veyî welate bi hin alyên xwenî esasî di çend gotinên kurt de.

Krîza nav komele dewam û dirêjayîya krîza si-yasî li Kurdistane. Ev krîz di esas û bingeha xwe dekrîza alternatîvên şaş, metodên ne demok-ratîk û bêtehemulîya xebata mişterek di nav rêkxirawekî sendîkal de ye.

Bi ser van teva û kûranîya krîza îro jî îmkane kar û xebatê di nav rêkxirawekî de bi bîr û bahwerîyên başqe başqe li dij her çar hikûme-tên Kurdistan di nava xwe de perçekirine ra-nebûye û divê xebat ji bo bê kirin. Ji bo xeba-tek wa [] û bi serketina wê jî, gerantî û riya bi tenê xwedîderketin li destkewt û prensîpên Komela Xwendevanên Kurdistan li derveyî welate Xwedîderketin, jiyandin û xwirtkirina giş ar-mancên esasiyî tevgera xwendevanên antî emper-yalîst û mobilîzekirineke aktîv li dor wan wa-zîfa rojê ye ji bo xwendevanên Kurd. Qedera ko-mele û perspektîvê komele bi vê mobilîzekirine ve pir girêdayî ye.

Ji ber wilo jî bi armanca kişandina bala enda-mên komele li ser rewşa îroyî komele û paras-tina prensîpên komele ke di xeterê dene orga-nek, Komîta Parêzgarî destkewt û prensîpên Ko-mela Xwendevanên Kurdistan li derveyî welat pêk hat. Armanca komîte di teniştê parastina prensîpên komele de binuhvekirina jiyana siya-sî û kulturî ye û mînaqêşkirina hel û çare ji bo krîza îro ye.

Li ser pêşketina fikr û xebata ronakbîrî

T E R X A N

Di mana ilmî de ronakbîr û xebata ronakbîrî, di merhalak konkretî tarîxî de di peryodê konkretî civakî de, di wextek wada ke êdî mirov bêhtir ji ewê jêre lazime û ihtîyaca wî pê heye çêdike bi hawakî xwiya û berçav dest pêkir.

Paş ke mirov di şerê nav xwe û dora xwede, di şerê xwe de bi teblatê re çen gavên baş davêje û qismek ji teblatê keşfdike, paş wêna ke di şerê nava teblat û însan de mirov dibe xwedî hinek tecrûbe û aletên mukemeltir çêdike û li ser vî esasî jî paş wêna ke di civatêde hêdî hêdî kar beşdibe û zanebûna mirovayetî bi pêşdikeve, paş wêna ke di civatê de newekhevî despêdike û gurûp û çînên sosyal pêktên imkan û mecalên ke hijmarek biçûkî însana keda pranîya insanên din ji xwere dike mal derdikeve. Di merhala pêşîyî tarîxê de ke ilm nasdike, berî newekhevî çêbibe û berî çînên sosyal derkevin hem kar û hem jî hatina kar kolektîv bû. Wexta tebakî wahşî bi şerê kolektîv dihate kuştin behra herkesî têde hebû û bi hawakî kolektîv jî dihate levakirin.

Bi wext û pêşketinê re çîn pêkhatin, civat derbasî merhalak dinî sosyal bû. Alyê helî karakterîstîk ji bo vê civatê, yanî civata çînayetî ke bingeh û esasê newekhevîya bi hezaran sal danî ewe, ke qismek mirov li ser hesabê qismê din dijî, qismek kar dike qismê din hatina vî karî dixwe. Li vir tiştê bi behsa meve giredayî û ji mere lazim ewe ke bi îstîsmarê re wextê valayî însan çêdibe. Çêbûna wextê vala imkanek û mecalek pirtir ji bo analîza dora xwe û binaskirindana dunyayê bi xwere tîne, xebata ronakbîrî dikeve ser rîya xweyî dûdirêjî tarîxî û mejyê insan dikeve kar. Îlm wek ber û prudukte xebata fikrî û kulturî dikeve herka xwe. Vê peryoda antîk gelek eserên hêja ke heta roja me hatine û pir zane û ronakbîrên mezin ke fikr û şewê fikirkirina insan bi sedan sal di bin tesîra xwe de hiştine derxist.

Armanç li vir ne analîzek dûr û dirêjî pêşketina fikir û merhalên xebata ronakbîrîye. Bi giştî rastî ewe, ke li Ewrûpa merkeza wê li wir yan li dera han, kar û xebata ronakbîrî çî wek belge bi nivîsandin be û çî jî wek eserên tarîxî be, heger 300-400 salek, salên di nav sedsalên 6-9 de ke peryodê reş derbasî tarîxa ronakbîrî bûye li alîyekî bê danîn bi şîweyekî ji hev ne kutkirî heta bi roja em têdene tê. Û di prosesê mukemelbûna xwe de sê momentên giranbuhayî tarîxî ke piştî xwe diden felsefan antîk û eme li vir bi kurtî îşaret bi wan bikin dide ber xwe.

A) ÇAXÊ RÖNESANS

Ev çax wek çaxê "ji nuhve çêbûnê" ruhpêkhatinê û geşbûnê wek reaksiyonek xwirt û ceryanek bi ruhî ronakbîrî beramber şiklê kevnarî fikirkirina Skolastîk û fikirkirina dînî û zimanê wê wek hareketeke sempatîzan û hejêkerê kultur û edebiyata Antîkî-Yunan û wek beletê civateke nuh bi pîvan û miqyasên însanî û rasyonel li Îtalya dixuliqe û paşren li welatên di beladibe. Însanê ronesans ji insanê çaxa berî xwe, însane zeîf û tirsonek, însane nebixe belê bi hêzên abstrakt û nependî bahwer, insanê dogmatîk û ziwayî bê taqet gerek ferq bike. Însanê ronesans gerek xwe piralî bighîne. Mîsal ji bo xwegîhandineke piralî Don-te (1265-1321) ye. Di kitêba xwenî bi navê "Komedîya Xwedê" de pirs û meselek ke Domte behsa wê nekiribe tine.

Di vê peryodê de fikra millî dikeve despêka birihbûna xwe. Û însan zanebûna xwe binuh vedike, şuphe beramber dogma û zanebûna kevn ji teref ronakbîrên ronesans tê belakirin. Vê şupha hanê esasê matafîzîk ji binî de hejand û di şûna wê de essekî li ser ferdîyeta azad pêktanî ke li dijî feodala pir bikêrî burjûvazî dihat.

B) ÇAXÊ RUHNÎ Û BIŞEWQ

Ev çax wek ber, produkt û dirêjîya ronesans paş çend sed salekî pêşî li Îngilîstan, paşre li Fransa û Almanya û welatên din di sedsala 18 de dikeve kemla xwe. Bi ronakbîrên vê sedsalê pîvan û miqyas ji ezmên dadikevin nava însana. Axret yan jî dinyaya dî tê vê dinyayê insanê cîhê xwenî civakî nasdike û ne ji bo axret û dinyaya dî, belê wek insanê dinyaya me dijî. Di vê peryodê de her tişt: dîn, dewlet

civat, sîstemê xwendinê, moral û exlaq, bi gotin nin kurt giş maneviyatîn civakî wek tu pembo ji hev vejîne ji hev tê vejandin. Şer û pevçûna civateke nuh ke li ser prensîpên rasyonel û aqlî avebûye û tê de her tişt li bêjînga aqil tê xistin bi hemî dînamîzma xwenî nuh dest pê dike. Aqil her tiştê, tiştêkî acil hec jê dernekeve û girêkek ke aqil nikaribê veke tune. Hêz û qeweta însan û bahwerîya wî bi xwe tu sînora nasnake. Seneetê fikirkirin û xebata ronakbîrî û îmkânên belabûna wê û bi hijmarek mestirî xelkê gihandina wê çend qat dibe. Eva jî mobilîzekirina komelanên xelkê li dijî feodalîzm ji teref burjûwazî hesantir û bi tesîrtir dike. Bi gotinên Engels ji bo vê periyodê: "Her tişt bi mehkema akil re hati bû himber hev. Ya li himber vê mehkemê wê hebûna xwe îspat bikra yan jî mafê hebûnê hunda dikir.. Aqlê însan û qeweta wî pîvan û miqyasa bi tenê û bê emsale... Giş form û şiklên kevn û derbasbûyî civat û dewletê, giş fikrên kevn û tradîsyonel wek tiştên bi aqil re li hev nakin hatne îlan kirin û ji ser rîya aqil hatne avêtin... Dinya heta vê wextê bi tiştên dogm û dijî aqil hati bû gerandin". Bi vê periyodê re roja mirovayetîyê û çaxê aqil der dikeve.

C) ÇAXÊ SOSYALÎZM

Wek di dest pêka nivîsandina xwe de me îşaret pêkir xebata ronakbîrî, kulturî û fikrî û berên wê giş şaxên ilm û li serê wana diya timamê ilma felsefe, ke di periyodeke naskiriyî tarîxî de bi pêkhatina çîna û îstîsmarê dest pê kir, hê di dest pêka xwe de xwedî karekterêkî çînayetî bû. Yanî ne tiştêkî bê alî û newtral bû. Eva çî ji bo felsefa antîkî Yunanîstan be, çî ji bo felsefa ronans û reformatorên wextê xwe be û çî jî ji bo xebata ronakbîrî û felsefa rasyonalistên mezinî sedsala 18 be raste.

Alyê mişterek û esasiyî felsefên Antîk, Ronesans û dawî rasyonalistên çaxa bi şewq, ke di tarîxa fikr û xebata întelektûalî de cîhekî esasî digrin, her yek ji wan di pêşketinê de qevzek tarîxî ye, çend xekekên zêrînin di prosesê "mikemalbûna normal û tabiiyî" welatên rojave de ewa bû, ke hersiya jî hebûna milkiyeta ferdî wek heqêkî esasî nas dikirin û qebûl dikirin. Li alyê di her yek ji wana ambar û kanîyeke zanebûn, analîz û tecrûbe bû û li paş xwe akumulasyonê fikrî dihişt. Di

sedsalên 17-18 de ev akumulasyonê fikrî û ronakbîrî kete dewra mikemalbûna xwe û bingehe teorîk ji derketin û çêbûna Marksîzm re pêk anî. Marksîzm wek baştirîn, rasttirîn, ilmîtirîn û bi rêk û pêktirîn komka fikrî ke heta wê rojê mirovayetîyê gihandîye ser hev/Lenîn/di alyê teorîk de dîrekt wek dewam û dirêjayîke konsektir û mikemeltirî rasyonalistîza sedsala 18 tê wicûdê û sosyalîzma modern çê dibe.

Çiye sosyalîzma modern?

Engels vê sîualê bi rengê jêrî paş wêna, ke rehê ekonomîkî derketina sosyalîzma ilmî; li alîkî têgihîştina şerê çînayetî û li alyê di têgihîştina hakimîyeta anarşî di produksiyon de wek faktorên sosyalîzm xwiliqandine dixeber çavan, gotinên xwe bi rengê jêrî dirêjayî pê dide: "Pêlê di alyê teorîk de wek dirêjayîke pêşketîtir û konsektirî prensîpên ke ji teref fîlozofên çaxa bi şewcî sedsala 18 li kîrensê hatine danîn xwe dide xwiyankirin. Sosyalîzma modern jî wek her teorîyeke dinî nuh bi ser wê de ke rehê wê dadi kevin kûranîya pîrsên îtîsadî jî, mecbûre bi akumulasyonê fikriyî berî xwe re bê girêdan"/Anti-Dühring/.

Bi derketina sosyalîzma ilmî, xebata ronakbîrî bi rengêkî kwalîtativî karekter dighwere, cîhê xwenî birastî û layiq di bîne, dibe çekê guhertina dinyayê û rakirina giş formên newekhevîyê; milî û çînayetî li giş alyên dinyayê.

Başê li himber dinyak wayî modern wek Ewropa ke eva 300-400 sale bûye sembolê demokrasî, medenîyet, ilm û pêşketinê û xwedî derbasbûneke dolemend û dagirtîye ji xebata fikrî, li Kurdistan xebata fikrî çawa ye, ronakbîrên Kurd di vî alî de çiqas tecrûbe û zanebûn ji mere komî ser hev kirine û îro merhala em ronakbîrên Kurd tê dene çîye û çî me tê xwestin??

Eva çend sîualin ke ronakbîrên Kurd divê li bersiva wan bigere. Berî her tiştî heger em ji realîta îro li ber çava ye û kême zêde her zane derkevin û li ser esasê tiştên ber çav û xwiya hin netîce ke bi behsa meve girêdayî ye derxin, divê em bêjin: feqîrtîyeke fikrî li Kurdistan hakime, xebata ronakbîrî gelek zêde û îmkân ne diye ew periyodên me li jor hijmartin derbas bike. Em vê rastîyê bi rastîyê bi rastîyeke ke di van her dû salên dawî

de bi sedan car hatiye minaqeşe kirin û kême her kesekî difikire cebûl dike têxin ber çavan: Em tev zanin ke li "urdîstana Îracê 14 sala şer bû û vî şerî ke çend peryod derbas kirin Kurd û dinya tev bi xwe hisand. Li ser vî şerî ke dirêjtirîn şer bû di tarîxa Kurda de gelo çend kitêb hatne hiştin û ders û tecrûba vî şerî di kîjan pirtûk, materyal û belgên tarîxî hatne kom kirin??

Tiştên di vî alî de hatine hiştin çarçewa çend meqale û broşur derbas nake. Heta îro jî nebûna analîzeke pîralî û têr li ser Kurdistanê Iraqê mestirîn û nuhtirîn valayî ye di tarîxa Kurd û xebata ronakbîrî de li Kurdistan. Enteresane ke piraniya pirtûkên li ser vî şerî û netîcên wê tene naskirin ji qelemên bêgana kesên ne Kurd derketine. Tiştê hê entesantir ewe, ke gelek caran ewanê ji teref "bêgana" hatine nîvisandin rastirin û mistewawanî ilmî jî gelek berz tire.

Ne her bi tenê li ser tarîxa van 14-15 salên dawî, belê bi giştî li ser tarîxa Kurda û struktûra civata kurdî ji 80% wan pirtûkên heta niha hatine nîvisandin ne ji qelemên ronakbîrên Kurd belê ji qelemên ronakbîrên ne Kurd derketine. Bi gotinê di heta îro jî kanya belge û materyalê her daxwaz ji bo nîvisandineke cidî li ser Kurda bêhtir ji ronakbîrên Kurd, muhtacê nîvisandinên ronakbîrên ne Kurde. Heta niha Kurd xwe ne bi alîkariya ronakbîrê xwe belê bi alîkariya ronakbîrên "bêgane" nasdike.

Eya tê çi manê û çi dibêje ?

Eva tê yek manê û yek tiştê esasî dibêje: Wek li jorjî îşaret pêhatkirin, lipaşmanyeye bigiştî aliyê esasîyî ronakbîriya Kurdî ye. Ev li paşmayinê giş wesf û dirûvên welatekî li paşmayî di xwe de digre. Perçebûn û bindestîya gelê Kurd û kultura dîne îslamê li aliyê din du faktorên dinî esasîne ke ev lipaşmayin çend qat kiriye.

Heger em çavekî bavên tarîxa 60-70 salên dawî li Kurdistan û bixwazin bi çend gotina alyên karakterîstîkî tevgera ronakbîrî bihejmêrin bi bahwerîya me rewş awa ye:

1) Xebata ronakbîrî ne wek xebatek daîmî û sistematîk, belê wek xebatek qut-qutî, zêf û û bela-vela tê berçav. Ev xebat jî gelek caran ne li Kurdistan û ne wek netîca dînamîzma hundir li welat belê gelek caran li derweyî

welat (Stembolê, Qahîre û Şamê) bûye.

2) Xebata ronakbîrî ne bûye çeryanek xurt û fireh (wek ke di serdema berî şoreşên burjûwazî li Ewrûpa xerbî hebû) û piştî xwe nedaye çînekî dînamîk, xurt û bihêz. Ew teşebûsên biçûk jî ke li vir yan li dera han wek derxistina rojname yan kovarekê mesele, ji ber meseleên teknîkî û gelek caran malî disekinîn û daîmî dernediketin.

3) Monopolê xebata ronakbîrî ji monopol û çekê çînekî beramber çîne di behtir, di bin kontrola ferd û aîlên naskirî deye.

4) Kar û xebata ronakbîrî nebûye zimanê komanên xelkê û gelek caran çarçewa çend xebat ji hukûmetên mintîqê û gilî û gazin ji dewletên mezin derbas nekiriye.

5) Alîyekî dinî karakterîstîkî tevgera ronakbîrî li Kurdistan, hakîmûna Makyavelîzm û pragmatîzmeke prîmîtîve ke bi hawakî gelek xurt bi dirêjayîya serokayetiya Berzani-partî di nava ronakbîrên Kurd de rehên xwe berdaye.

Îro li Kurdistan bîngeh û esasekî madî ji bo çeryanekî xurtî ronakbîrî di mana rasyonîzm û ronakbîrtîya sedsalên 17-18 de ke motorê şoreşên burjûwazîbûn nemaye. Her ronakbîrekî Kurd ke vîna nebîne di fikr û nerîna xwenî dunyayê de çend sedsalekî li paş mayiye û ji bo wilo jî aktîvîta wîna ronakbîrtî, ji wê bêhtir ke tevgera rizgarîxwazî gelê Kurd bipêşxe li paş dixîne û dibe kelemek di pêşya pêşketinê de.

Tiştê karakterîstîkî ji bo rewşa anhayî Kurdistan ewe ke pir şiklên kultur ji civatên core-core di tenîştî hevde dijîn. Ji ber wilo jî pîrs û meselên ronakbîrên Kurd ke bi wan re li himber hevîn ne yek û dudo ne û ne her bi tenê ew pîrs û meselênê ke bersiva wan ji ronakbîrên burjûwazîyî berî şoreşa Fransa dihatne xwestin, belê giş ew pîrs û meselene ke bi hezaran sal komî serhev bûne. Bi gotinê di barê ronakbîrekî îro ji barê ronakbîrekî berê niha bi duset salî gelek girantire. Dîtinî bersiv û cewabên pîrs û meselên îroyî Kurdistan ke gelek tevlihevtirin, ronakbîrên asra me ronakbîrên modern, bi kapasîte û hecmeke gelek firehtir dixwaze. Kapasîte û hecmeke wa jî ji teref burjûwazîya Kurd ke ne serbixweye û bi hezar benî bi derve ve girêdayîye nikarê bê derxistin. Ronakbîrên kev-

nar û burjûwazîyî Kurd îro bi giştî ya bi ronakbîrtîya resmî û di îqtidarêde li mintîqê hatîye girêdan yan jî li ser vê rîyê ye.

Paşverûtiya Kurdî çî li ser mistewa Kurdistan be û çî jî li ser mistewa mintîqêbe li ber temamkirina prosesê girtina cîhê xweye. Îro roj roja ronakbîrên şoreşgere. Ronakbîrê şoreşger jî nikarê ronakbîrên burjûwazî be. Îro slogan û şiarên burjûwazî ke bi dirêjahiya serokayetîya Berzanî-partî ji bo lihevkomkirina komelanên xelkê bi kar di hatin anîn hêz û dînamîzma lihevciwadina xelkê bi hawê kevn hundakirîye û bi guhen xelkê nexweş tên. Tiştê helî esasî û karakterîstîk ji bo xebata siyasîyî paş bazdana burjûwazî yanî xebata wan çend salên dawî li Kurdistan ewe ke li alyekî bi giş fraqsyonên xwe burjûwazî û li alyê di burjûwazîya biçûk xwe wek "dostên" krêkar û zahmetkêşan didin xwiyankirin û di propegendê xwenî rojê de slogan û şiarên çep heta pir caran "sosyalîstî" û "Marksîstî" davêjin. Eva jî ji îflasa burjûwazî û hez û quweta xort û dînamîkî proletarya pêvetê çî manê. Gerek vena aqil û hişê wan kesên ke xwe wek Marksîst nasdikin û bi gotinên wana "ji bo girtina îqtidarê hê proletarya zeîfe" banya serê wana. Rastîya ke îro roj ne roja burjûwazîya Kurde û nemaze paş xiyaneta Berzanî însiyatîf ji destên burjûwazîya Kurdî derketîye û eva jî ji hewar -hewarên wan ke anha bi riba hukmê xwenî berê qanihin û bidest wan nakeve xwe dide xwiyankirin ne kafî û bese ji bo ke burjûwazî û hêzên reaksiyoner carekê din serê xwe ranekin û li ser vî esasî jî bê şer û pevçûn îktidar di destên hêzên şoreşger keve. Faktorê objektîv û tarîxî çiqas li alyê şoreşgeran dibin bela bibî di wextek wade ke Kurdistan ji teref çar hukûmetên reaksiyoner û ser bi emperyalîzm ve havîrdor hatiye girtin, xwe hazirkirin û xwe amadekirin ji bo şerekî dûr û direj pêwîste. Bi bahwerîya me xwe hazirkirin û xwe amadekirin ji bo girtina cîhê xwe

di vî şerê dûr û direj de wezîfa esasî û bingehînî ronakbîrên şoreşger yanî dijî burjûwazîye.

Di mana praktîk de xwehazirkirin, keşîfkirina burjûwazî û şerê dijî burjûwazî û di ma-

na teorîk de jixwere malkirina marksîzm û tecrûba enternasyonalîstî dixwaze. Çî li Kurdistan be û ji jî li derveyî Kurdistan di nav ronakbîr û xwendevanên Kurd de be, şermûzarkirina paşverûtiya kurdî bela sloganê ronakbîrên şoreşger be.

F Ê H R Î S T

- 1- Çend gotin li ser pêwîstîya vê kovarê..... 20-22
- 2- Ji vê sergêjekîyê çawa derkevin?..... 22-24
- 3) Şerê çînayetî û mesela milî li Fînlad..... 24-29
- 4) IO Sal paş şehidbûna heval Smaîl..... 30-31
- 5) Şerê çînayetî û tevgera milîyî kurd
li Îraqê paş sala 1958..... 31-37
- 6- Komela xwendevanên Kurdistan, tarîx û
rewşa wênî îro..... 38-39
- 7) Li ser pêşketina fikir û xebata ronakbîrî..... 40-43

www.arsivakurdi.org

